

# Vîn

“raye zana”

## 2

1.temmuze.2026 cüye edebîyat fikr



asya xerzan ■ aydin ekîn ■ azad kaysadu ■ berken bereh ■ dîna sîrwan  
donald barthelme ■ fabián espejel ■ faîq bucak ■ fevzî ozluer  
haden oz ■ hevî xebar ■ îbrahîm şêxşerefî ■ jamaica kincaid  
jiyar homer ■ kawa nemir ■ lokman ayebe ■ lorîn demirel  
luis cernuda ■ margarete beutler ■ mary oliver ■ mîr celadet alî bedir-xan  
noëlle revaz ■ netîce altun demir ■ qedrîcan ■ rostem axale  
sayo receb ■ sedat ulugana ■ selaheddîn bayezîdî ■ selîm temo  
sevgî sariyildiz ■ sîbel akman ■ sylvia plath ■ şallaw hebîbe ■ şerîf kaya  
william butler yeats ■ william shakespeare ■ yunus karakoyun



‘Kurmanciya wan:

‘Besam ‘Mistefa, ‘Îbrahîm Şadman, Sergûl Areş, ‘Ronya Çalî

SKZ / ‘Neqş – ‘Rojavayê ‘Kurdistanê, 2023



Kovara Wêjeyî û Ramanî ya Dumehane

**Lijneya Weşanê:**

Gulê Şadkam, Îbrahîm Şêxşerefî, Jiyar Homer, Lorîn Demirel,  
Netîce Altun Demir, Rojîn Şêx Hemo, Selîm Temo

**Dîzayn:**

Leyla Çelik

✉ info@kovaravin.com / simupikol@gmail.com

📷 @kovaravine

✂ @kovaravine

📌 @kovaravine



# Naverok

|                                                                                   |       |
|-----------------------------------------------------------------------------------|-------|
| azad kaysadu: xêzê sînoran û ontolojîya nasnameyî .....                           | 5     |
| berken bereh: bîr û bîranîn 1: asîmîlasyon .....                                  | 8     |
| donald barthelme: wendegeh .....                                                  | 12    |
| fabîan espejel: xofo .....                                                        | 15    |
| fevzî ozluer: ji siya dara hinarê heta govenda rengan... ..                       | 16    |
| sevgî sariyildiz: "bênav", "derazînk" û<br>"yên di binê demê de mane" .....       | 17-19 |
| haden oz: tu ama .....                                                            | 21    |
| hevî xebar: cuya bêpeynî .....                                                    | 22    |
| jamaica kincaid: keşik .....                                                      | 24    |
| kawa nemir: -3 <sup>o</sup> : II. dewlet û kulîlk .....                           | 26    |
| lorîn demirel: dema nêzanîye de nika - I .....                                    | 28    |
| luis cernuda: ligel te .....                                                      | 30    |
| margarete beutler: gava min dev ji odeyekê berda,<br>ya ku min jê hez dîkir ..... | 31    |
| mary oliver: katê merg dê .....                                                   | 32    |
| noëlle revaz: çawerrwanî .....                                                    | 34    |
| selîm temo: bi carekê .....                                                       | 38    |
| sylvia plath: lady lazarus .....                                                  | 41    |
| şallaw hebîbe: hoşdarî bo şa'îran .....                                           | 42    |
| şerîf kaya: cêwîkujî .....                                                        | 43    |
| william butler yeats: hezar û neh sed û nozdeh .....                              | 46    |
| william shakespeare: soneyê 66. ....                                              | 52    |
| yunus karakoyun: dilê hespê mirî .....                                            | 53    |

## hevpeyvîn:

|                                                   |    |
|---------------------------------------------------|----|
| lokman ayebe: welatê peyvên min pirr kevn e ..... | 54 |
|---------------------------------------------------|----|

## bîrdank:

|                                 |    |
|---------------------------------|----|
| faîq bucak .....                | 60 |
| mîr celadet alî bedir-xan ..... | 61 |
| qedrîcan .....                  | 62 |

## belgedank:

|                                                                           |    |
|---------------------------------------------------------------------------|----|
| sedat ulugana: belgedank 2:<br>teblixa resmî, agirî /9 temûz (1930) ..... | 63 |
|---------------------------------------------------------------------------|----|

# *Vîne* û Çiyê ke Temsîl Kena

Kurdî, bi fikrê xoyê sîyasî, bi dîn û bawerîyanê xo û bi zafzaravayîya xo rengareng ê. Temsîlkerdişê na dewlemendî mixabin heya nika zafêrî pîya nê, xo cayê cîya cîyayan de nîşan dayo. La Kurdî yew ê. Hewcedarîya ma bi yew ca esto ke ma heme rengan pîya bivînîm û weşîya na zafrengî sey tabloyêko nê renganê ke beynatê ê bînan de benê vindî zî te de bivînîm. *Vîne* na tablo ya.

*Vîne* de helbet tay qaîdeyî estê û duzenêk esto. Azadîyê fikr û ramanan de nê, la vengê kesê ke wazenê sînoran ronê miyanê Kurdan de, înan rê ca çîno. Yew çî ma motive keno: Heskerdiş. Heskerdişê Kurdistanî, yê azadî, yê pîya biyayiştî, yê dînya û esqî..

Kovara *Vîne* o awazêko edebîyatê Kurdkî berz bikero a ya seba ma. Ya zîyew nuşttox û beno ke yew zî şaîrêko/a sey dengbêjêke goşanê kerran de biqîro û venge ma birisno asîmano hewtin. Her ciwan/e, her fikr, her êş erjîyayê goşdarîkerdiştî yo. *Vîne* seba naye îrade nîşan dana.

Her Kurdêko wazeno vengêk verdo demo ameyoxî rê bi xeyr yeno. Seba ke nîyêtê ma esto ke ma vengê xo birisnim dînya û sibayanê tarîxî.

*Vîn*




Արամ Տիգրան /  
Արամ Դիկրան – Արամ Մելիկյան

(15.02.1934, Qamişlo, Kurdistan – 08.08.2009, Aîna, Yewnanistan)

Քêz: Ercan Altıntaş

Azad Kaysadu

# ‘Xêzê Sînoran û Ontolojîya ‘Nasnameyî: ‘Înkar ra ‘Ver bi ‘Xo-biyayîş



Hişê mêtîngeran, wexto ke wazeno şarêk çin bikero, dest bi xirabkerdişê xetanê cografya û bîrî keno. Her xêza sexte ya ke nexşeyan ser o ancîyena, tenya hardî parçe nêkena; wazena ke hişmendîya komkî, ziwan û dewamîya wextî zî parçe bikero. Bextê Kurdistanî yo sîya yê seser-ran û têkoşînê bîyayîşê şarê Kurdî, raşt mîyanê nê parçe-bîyayîşî de wayirê es-tetîkêkê xoverdayîşî yo ke şikil gêno. Labelê ewro, mesele tenya mîyanê parantezê leşkerî yan zî jeopolîtîkî de asê kerdiş, qebulkerdişê ziwanê serdestan o yo kemîkerdox o. Perso bingeyîn o ke ganî ma bipersîme û cewab bidîme no yo: Verba mekanîz-mayanê înkâr û asîmîlasyonî yê seser-ran, ma do senîn nê sînorê reaksiyonerî ra derbaz bibime û xobiyayîşê xo yo fel-sefî û kulturî awan bikerime?

‘Mekan, qalikê pawitoxê bîrî yo; wexto ke mekan ame tasfîyekerdene, mîtolojîya ke o mekan keno berhem, girêyê komelkî û ziwan zî xeterîya bêkoke-mendîşî dir rî bi rî manenê.

### **I. Heliyayîşê Mekanî û Bedilnayîşê Ontolojîya Koyan**

Bîyayîşê Kurdan de “ko”, qetî tenya berzîyêka cografîk yan zî stargehêko leşkerî nêbîyo. Ko, hemberê hîyerarşîya dewlete, sînoran û otorîteyanê merkezî-yan a asîmîlekerdox, dîk û pelixnax de; formê cuye yo asoyî, xoser û stû-nêçewtnayox o. Tespîto tarîxî “Koyan ra pêştir dostê Kurdan çinyê”, hetê psîkolojî de tenyayîyêk îfade bikero zî, hetê felsefeyî de îlanê xoserîya mutlaq o.

Labelê dinyaya seserra 21. ya ke bîya global de, koçberîya mecburî û polîtîkayê bêkeskerdişî yê sîstematîkî, no hîsê mekanî zaf kerd xirab. Komel, a cografyaya xo ya dîk û pawitox ra ameyo cîyakerdiş û ameyo eşîşê deştanê asîmîlayonî yê metropol û dîyasporayî. Mekan, qalikê pawitoxê bîrî yo; wexto ke mekan ame tasfîyekerdene, mîtolojîya ke o mekan keno berhem, girêyê komelkî û ziwan zî xeterîya bêkoke-mendîşî dir rî bi rî manenê. Hişmendîya neteweyî ya ke cografyaya xo ra bibrîya, eke zemînê xo yê entelektuelî awan nêkero, wextî dir bedilîyena nostalgîyêka folklorîk a zere-veng. Dawa, tenya pawitişê hardî nîya;

pawitişê o manayo şoreşger û tarîxî yo ke hard zihnê ma de viraştö, awa dawa.

### **II. Ziwan: Çîmentoyo**

#### **Yegane yê Nexşeya Parçebîyaye**

Kirmanckî, bêyî ke peyê aye de amûrêkê dewleta sazîyî, destegê akademi yan zî zirxêkê qanûnî bibo, bi serran tenya bi xeyrê a bîra gewre ya qewîm a dengbêjan û lorîkanê mayan weş menda. No, tarîxê dinya de xoverdayîşê ziwani yê tewr pîlan ra yew o. Labelê krîzo ke ewro ma rî bi rî yê, qedexeyanê rûtan ra vîyarto. Hegemonyaya psîko-ziwanî ya ke ziwane netewe-dewletanê serdestan û kapîtalîzmö dîjîtal afernayö, neslo newe ziwane dadîya xo ra keno xam.

Tîya de xeterîya tewr pîle awa ke, ziwan bibo tenya “xatirayêka mîyanê keyeyî” ke pîlan dir qise bena yan zî bibo “ziwanê şînî” yê vîyarteyî. Eke ziwane nêşkeno wexto nika awan bikero, nêşkeno felsefe biaferno, barkêşîya sîyaset û hunerî yo binyat ra vejîyêno, o ziwan hêdî hêdî sehneyê tarîxî ra xo anceno. Dewlemendîya zarawayan sey wesîleya cîyabîyayîşî xebitnayîş, rûn sawitişê nanê

‘Bêyî ke ma muhtacê  
tesdîqê serdestan, sînore  
meşrûîyetê ke înan antê,  
yan zî destûrê înan ê  
entelektuelî bibîme;  
ma mecbur ê ke estetîkê  
xo, rasyonâlîteyê xo yê  
felsefî û modernîteyê xo  
biafernîme.

polîtîkayanê zîwanî yê mêtîngeran o. Kurmanckî zî, Kirmanckî (Zazakî) zî, Soranî zî nê cografyayo parçe-bîyaye sero tek pirdê têmiyan-kerdox ê. Pawitişê zîwanî reflekso defansîf nîyo, bi termanê dinyaya moderne o fîna afernayîş, hemleyêka entelektuel a taarrûzî ya.

### III. “Lengbiyayîşêko Fanonvarî”:

#### Reaksîyonerîye ra Ver bi Xobiyayîşîya

Franz Fanon, kitabê xo yo ‘Lanetbîyayeyê Riyê Erdî’ de vano, trajêdîya tewr pîle ya bindestan awa ke, xo tim goreyê cakerdiş û înkare “serdest”î pênase kenê. Şiyarbîyayîşê Kurdan, goreyê şertanê tarîxîyan, wextêko derg yew xeta reaksiyonere sero şîkil girewto: Verba înkare serdestî bîyayîşê xo îspat kerdiş û verba şîdetê ey sîperê fizîkî û kulturî girewtîş. Na, qonaxêka nê-remayîşî û bi rûmet bî.

Labelê lengbiyayîşêko ke ewro viraz-

yo de, tenya zilmê “ê bînî” sero xo awan-kerdiş, verê xobiyayîşî de bendo tewr pîl o. Ma tenya pêserameyîşê qirkerdişan, trajêdîyan û surgunanê ke ma rî bi rî mendê nîyê. Hişmendîyêka neteweyî ya raştîkên, mecbura ke aksîyoner biba. Bêyî ke ma muhtacê tesdîqê serdestan, sînore meşrûîyetê ke înan antê, yan zî destûrê înan ê entelektuelî bibîme; ma mecbur ê ke estetîkê xo, rasyonâlîteyê xo yê felsefî û modernîteyê xo biafernîme. Kulturo Kurdî, çîmanê dagirkeran de “objeyêko egzotîk” bîyayîşî ra vejîyêno û ganî bibo xobiyayîşêko mutlaq ke tarîxê xo bi çekuyanê xo nusena.

#### Qiseyo Peyên: Kozê Binê Welî

Kurdistan û şaro Kurd, nexşeyan û sînoran ra wet, felsefeyêko bêwext ê xoverdayîşî yê. Tu dejêko ke nê-nusîyayo, felsefeya ci nê-virazîyaya û bi dîsîplînêkê edebî tarîxî rê not nê-kewto, dinyaya siba de heqê xo nêeşkeno bigêro. Kovarî, kitabî û her kelîmeya radîkale ya ke emanetê nê pelan bîya, kozên nêkewteyî yê adirê Newrozî yê binê welî yê.

Dawa, tenya xoverdayîşêkê bîyayîşo fizîkî nîya; dawa a ya ke, ruh, ziwan û ameyoxê na cografyaya qedîme teslîmê laboratuvaranê îdeolojîkî yê serdestan nêkerdişî ya. Ê na dawa, tenya bi zelalîyêka entelektuel, bi cumleyanê bê-tawîz û hişmendîyêka bi berpîrsîyarî ya tarîxî eşkena bireso serfirazî. ●

# Berken Bereh

## Bîr û Bîranîn 1: “Asîmîlasyon”

Roja min kap û deqên xwe hêla li dû xwe  
Koçî êla dê bextewariya min biherimîne kir;  
Min zanî dew birê mast e, xizanî kurê pîrê, divê  
Ji nû ve bê zuhr kirin pişta vê eyneyê.

.....

.....

.....

Lê, Zarokê bi gilçê dileyîst bû yê min şîr didayê  
Yê di navbera diranên êl û eşîr û şêxî de  
Asê mayî û ji bîr bûyî

19 ê Gulana 2026an bo Roja Zimanê Kurdî mêvanê şaredariya Surê ya Amedê bûm. Moderatorka “Bernameya Şahiya Helbestan” Laleş Biçimli bû. Helbet min Laleş xanim beriya gellek salan (51) nas dikir.

Piştî bernameyê dema em bo xwarinê çûne Deriyê Çiyê min di rê de gotê;

-Tê bîra te dema te li mitînga Farqînê bi kurdî şîr xwendî.

-Tu ji ku zanî, got. Ma tu li wir bûyî?

-Belê ez li wir bûm û min keçika 11 salî ya çavşîna porzer bi serbilindî temaşe û guhdar kir. Her wiha bi xwendina te re bawer im bawerî û coş û mêrxasiya hemû beş-daran du kat bilindtir bû.

Çavên wê bi mij û xumamekê demekê li derdorê çû û hat û paşê bi ken;

-Erê bavê min ji xwe re kiribû edet ku di her çalakiyê de ez derkevime ser dikê û

Gara ewil sloganên  
 “Kurda ra ‘Azadî”, “Bimre  
 ‘Mêtingehkarî” û “Bimre  
 ‘Faşîzm”, “Bimre ‘Axatî”  
 hate qîrîn. ‘Em ji Şîrnex û  
 ‘Dihê ya hingê li ser Sêrtê  
 bû bi şal û şapikên xwe  
 beşdarî mitîngê bûn û  
 eleqayeka bilind bo me  
 hebû.

bi kurdî şîr bixwînim. Heta piştî wê bernameyê bi salekê li Wêranşarê şeva ku sibe Şivan Perwer derkeve derveyî welat beriya wî ez derketim ser dikê û piştî bernameyê xwestin min bigirin. Dostekî bavê min ez di deriyê piştê re revandim û bire gundê xwe; piştî panzdeh rojan vegeryam Farqînê.

Wê şevê ta derengî me behsa wan rojên xort û keçên kurdê xwendevan ku wek guryê ketibe nava pez û bixwaze yek jê nefilite me berê xwe dabû pirtûkên li ser rewş û tekoşîn û berxwedêrî û tecrûbeyên neteweyên bindestan.

Mitînga Farqînê yek ji wan mitîngan bû ku beşdar xwedî hiş û bîr û baweriyêke netewî û zêrevanê çand û kultura xwe ku her herêm bi cil û bergên xwe yên netewî an herêmî beşdarî lê kiribûn. Yek ji wan mitîngan bû ku dirûşm

û axaftinên bi kurdî lê hate kirin. Ji ber ku hê kurd di navbera xwe de bi qasî herfên elfabeyê nebibûn fraksiyonên cuda girseya mitîngê pirr têr û tije û jidil û dilsoz bûn. Cara ewil sloganên “Kurda ra Azadî”, “Bimre Mêtingehkarî” û “Bimre Faşîzm”, “Bimre Axatî” hate qîrîn. Em ji Şîrnex û Dihê ya hingê li ser Sêrtê bû bi şal û şapikên xwe beşdarî mitîngê bûn û eleqayeka bilind bo me hebû. Min Muhterem Biçimli, Abdulkerim Ceyhan, Mehmet Tüysüz û gelek şoreşgerên wê demê nasîn. Nemaze Mehmet Tuysüzê ku di sala 1971an de Li Hezoyê min bi heyranî lê guhdarî kirî ku şîra “Ben Hamal Hamo’nun Kızıyım Amca” xwendibû ji nêz ve binasim. Bextê min rê da ku heval û rêberê me yê hingê yê Şîrnexê İdris Anık ez li wî, Muhterem Biçimli, Abdulkerim Ceyhan û yekê bi navê Salim dam nasîn û gotê ku ev xortêke gelek jîr û jêhatî ye ku sibê dê bi rabûn û rûniştina xwe gellek deng vede.

Mitîngên hingê di heman demê de rol û mîsyona perwerdehiya siyasî û rêxistinî pêk dianîn. Ji ber ku rêxistin û partiyên me nehênî û veşartî bûn. Lê dema rêberê bajarê me xwe nêzîkî yekî fikir û xwe didan aliyekî û bi pistepist di-axifîn, me dizanî ku ew endamên rêber û kesên xwedî erk û berpirsiyariyên bilind in û tiştê ku diaxifin tiştine gellek muhim û biqîmet in. Min û ciwanên heval gellek xweziya xwe bi wan dianîn ku

wiha mêrxas, jixwerazî û tekoşêr in. Lê piştî salan ku ez jî bûm yek ji rêveberek yê fraksiyonekê min dît û bûm şahid ku gellek caran kes bo xwe wek kesên ne ji rêzê û layîqê hurmet dîtin û qedir-dayînê ne û da serwerî û hukimraniya wan neyête nîqaşê van ritûelan bi zanebûn pêk tînin.

Sal dawiya sala 1970yî li Hezoya ku bi malbatî lê dijiyam şaxa DDKOyê hate damezrandin. Wek xortekê hişyar, xwenda û birçiyê xwenasîn, qedirditîn û wek keseke jîrê hîlbijartî digel Abdi Işık ku zavê wî yek ji damezrîneran bû diçûn komelê û dihatin. Helbet sihet û dokumentên li komeleyê dikirin ku her roj em wek surprîzekê leqayî tiştine nû bîn. Helbet me dîzanî û em gellek caran bibûn şahid ku cendirme bi behaneyê “eşkiya” davêtin ser gundan û gundiyên reben dixistin bin darê feleqê. Heta berêvarekê ez û çend heval li parka li hember qereqolê bûn ku jinişkav me dît cemseyek leşkerî ta dev bi mêr û jinan teji li meydanê rawestiya û kesên di cemsê de bi zincîran bi hev hatibûn girêdan û dema cendirme pehînek li yê ber derî da û ket xwarê ên dinan jî li pey hev gindî ser hev bûn û qarewara wan çû ber erşê xwedê. Ta îro jî dema ez wê dîmenê bi bîr tînim wek danînbîn li ser singê min diêşim.

Bavê min ê ku xwenda û dimoqrat û kurdperwerek bû jî ji vê çûna min a

Ji wê şeva ku ji tîrsa lêdanê be jî min dengê xwe nekir lê min ew şîreta bavê xwe ta îro jî qet bi cî neanî, lew hê jî her du camêr hem dostê min in û hem jî bê pêzanîn û baş xwendinê bi korane tu pîroziyan nahebînim.

komeleyê dema haydar bû şevêkê ez li hember xwe rûniştandim û destê xwe di serê min re bir û anî û bi delalî gote min:

-Bexê bavê xwe, min hay jê heye ku diçî komeleyê û tu zanî ku ez çiqas kezê bşewatê gelê xwe me. Lê em li vir biyanî ne û kesê me biparêze tune. Ji ber hindê tu bi ya min bikî neçe komeleyê an kêma cara here û ya muhim jî, bextê te kurê min; di warê kurditiyê de bila lê di warê dîn de guh nede Mele Elî û Mele Evdîlsemed, lew ew qomonîst in. Dijberî dînin û em jî dê bi te re gunehkar bibin.

Ji wê şeva ku ji tîrsa lêdanê be jî min dengê xwe nekir lê min ew şîreta bavê xwe ta îro jî qet bi cî neanî, lew hê jî her du camêr hem dostê min in û hem jî bê pêzanîn û baş xwendinê bi korane tu pîroziyan nahebînim.

Piştî çend heyvan ku Mele Evdi-  
layê Timoqî li odeya qeymeqam hate  
piçûkxistin û raberizînê DDKOyê li Hezo  
mitîngê amade kir. Berî mitîngê em  
çend xort me rahişt afîşên bi qasî nîv  
bejna min hebûn û li ser wan dirûşm  
û nivîsên balkêş hebûn: “Batiya Fabrika  
Yol, Doğuya Komando Karakol” (Fabrîk  
û Rê ji bo Rojava, Qomando û Baregeh  
ji bo Rojhilat), “Karakol deşil okul isitiyo-  
ruz” (Em ne baregeh lê dibistan dixwa-  
zin), “Doğunun kaderi açlık, işsizlik, hor  
görülme. Bu vatan ya doğu ne” (Qede-  
ra Rojhilatê niza, bêkarî û biçûkdîtî. Ev  
welat e lê rojhilat çi ye) û “Asimilasyona  
Hayır” (Na ji Asîmîlasyonê re).

Wê şevê min ji bavê xwe pirsî ka pey-  
va “asîmîlasyon” tê çi wateyê? Ewî gote:

-Bi Xwedê ez jî nizamim kurê min. Lê  
ez ê sibe ji hakimî bipirsim.

Roja din bi şev gote:

-Willeh hakim gote, “asimilasyon tiş-  
teke pirr xerab e. Mirov nahêle xelk bi  
çand û kultura xwe bide bistîne û zima-  
neke din li ser wan ferz dike.”

Wê rojê fêr bûm ku rewşa me çima  
wiha ye û sitem û zordariya li ser me  
bo çi ye û tê çi wateyê. Wê rojê min bir-  
yar da ku li hember asimilasyona xerab  
rawestim, bo rê libergirtinê têkoşim.

Carna bûyerek ji xwendin û şîretan  
bêhtir mirovî perwerde dike û wek findê  
şev û nezanîna mirovî ronahî dike.

Dema me rahişt afîşan û li cadeya

Hezo li dîwarê dikana ve xwest daleqî-  
nin piştî çend dikanan dikandarek niha  
navê wî ne di bîra min de ye gote;

-Çi dikî, çima wê bi dikana min ve  
dikî? Her li Şîrnexa xwe ve bike. Tu  
dixwazî serê me bêxî belayê û raberizî  
min ku li min bixe. Lê hevalan nehişt ku  
li min bixe. Min bi hêrs gote ku, em ji  
bo we dixebitin û dixwazin hûn jî wek  
herkesî bextewar bin, vêca çima ev dibe  
neqencî?

Her wiha wê rojê li min da zanîn ku  
hê gellek ji me re lazim e û bi vê fêr-  
set û hişmendiye em nikarin xwe ji bin  
tu baran rizgar bikin. Tu carî min hez ji  
tu êl û eşîr û babika hez nekir û ya xwe  
jî neeciband û her li hember wê fêraset  
û hişmendiye rawestim. Aha ew her sê  
ristên di destpêkê de jî encama wê bû-  
yera min jiyayî ye. Ê hê jî bi hesreta ka-  
milbûna civakeke ku li wir her kes bi qes  
qedera zanîn û kesayeta xwe heyî ye. Lê  
digel hemû xweşî û nexweşî û serpêha-  
tiyên tehl û tirş jî:

Firêqet be ey dil

Zanim cihê min li kû ye

Bi kû dera destê jiyane bigirim

Ê biparêzim wê ji xêrnexwazan

# Donald Barthelme

## Wendegeh

Ewk, ma nê tûtî heme vetîbî teber ke daran ronê, çunke ma fikiryê ke no perçeyêkê perwerdeyê înan o, seba ke ê bivînê sîstemê kokê daran senîn şixulyeno. Û weko bîn zî hîssê berpirsiyarî, çiyêk weykerdiş, berpirsiyarîyêka şexsî bimûsê. Şima fam kenê ez se vana. Û darî heme merdî. Darê porteqalan bî. Çîrê merdî nêzana ez, tenê merdî. Beno ke erd de problemêk estibi ya zî çiyê ke ma bexçeyê cotkarî ra girewtîbî zaf hol nêbî. Ma ê şikayet kerdî. Yanî hîris gedeyî bibî, her gedeyî xo rê darêk nabî ro û nika destê ma de hîris darê merdeyî bibî. Nê heme hîris domanan ewnîyê nê hîris darikanê qehwerengîyan ra. No rewşêko zaf zerrîşiknayox bi.

Tenê çend hefteyî verê ke darî merdî, heme marî zî nêmerdê rewş hende xirab nêbîyê. Labelê ez vana qey marî- ewk, marî no semedo ke ezo vajî ra merdî. Do bêro vîrê şima, seba grev, qazan çar rojî panaye mend û merdim êşkeno nê îzah bikero. Şima êşkê gedeyan rê grev îzah bikerê. Yanî do dadî û babêyê tu qicî nêverdayêne ey xetê grev derbas bikerê û domanan zî zanê ke grev esto û no yeno çi mana. No rid ra gama her çî newe ra dest pê kerd û ma marî dî, gedeyî zaf bine tesîrê mergê maran de nêmendî.

Baxçeyê nebatan/botanîkî de îhtîmalêko pîl rewşê zaf awdayişî estibi û tewr tay nika ê zanê ke gerek zaf awe nêdê. Tûtan zaf îhtîmam nîşanê baxçeyê nebatan dê û înan ra tay, îhtîmal esto ke... şima zanê gava ma nêewnîyê gumêk zêde aw dê nebatan. Ya zî beno ke ez nêwazena sabotaj bifikirî la o zî îhtîmal o bêro aqilê ma. Ez wazena vajî ke no zî hişê ma ra derbas bi. Mûhtemelen ma wina fikiryayî çunke verê nê serebûtî Gerbîlî (merreyê çol) merdî û merreyê sipî merdî û Semenderî (heywanêko şino ro Malewî) zî merdî... Ye. Nika ê zanê ke ganî Semenderan zerê torbikê plastîkan de meberê wever û naver.

Helbet ma hêvî kerd ke masê tropikalî bimirê. No qet ma rê ecêb nêami. Nê maseyî hend hessasê ke ti înan ra çewt bile biewnîyê, xo peyser erzenê û vecyenê awe ser. La gorê planê derse, o wext de maseyê tropikalî estîbî û çiyêko ma bikerim çînêbi. No,

her serre beno û ganî ti lez nê peyê xo de verdê.

Heto bîna hêvîyêk ke ma wayirê cewrikêk bim çinêbi.

Ganî hebêk cêwrikê ma zî çinêbê. La o tenê cêwrikêko qijkek bi ke rojêk keynaya namê caye Murdoch bî, o bine kamyonê marketê Gristede'an de dîbî. Murdoch tersabî ke wexto ke şofêr teslîmatî biqedêno kamyon do cêwrikî bipelexo, o kerdibi çentê xo û xo dir ardibi dibistan. Bî no awan cêwrikêkê ma virazyabi. Mi senîn o dî, mi va oyy Rebbî, esto çinyo di hefteyî ciwîyeno û dima ra... Û wina zî bi. Ganî bi tu awayî sipêk dibistane de nêbo, nê sero tay qaîdeyî estê, la gama cêwrikêk xora ewca de bo, tam vernî înan de yo û remeno, ewt ewtê cê ya, ti nêşkena vajê ganî cêwrikê şima çinêbo. În namê eyî Edgar nabi payanî namê mi. Gava tûtî eyî dima remê û vatê "Bê tiya, Edgar! Edgaro şêrîn!" keyfan ra merdê. Dima ra huyayîşan ra merdê. Keyfê înan amê ke nedîyar bi gava vanê Edgar behsê mi kenê ya behsê cêwrikî. Keyfê mi zî amê. Bî mi tinazan bikerê ez aciz nêbena. Gedeyan seba eyî dolabê zexîrî de koxikêk viraştîbî û tay çîyo bîn. Ez nêzana çîrê merd. Ez bawer kena ke dîstemper (nêweşîyêka sipan/kutikan) ra merd. Mûhtemelen qet derzîne nêdabi piro. Verêko tûtî ameyî mi o ewca ra vet. Mi her serê sibayî biduzen dolabê zexîran kontrol kerdê, çunke mi zanê do sebo. Peyina peyin, mi laşê sipî da ra xedemeyî.

Dima ra meselê seybûrêko Koreyijî

bibî ke sinife o çarçoveyê bernameyê "Ma hetê Gedeyan Bikerim" de weçîna-bi. Fikir no bi. Her tût do her aşm çaryek dolar biyaro seba hetkarî. No hedîseyêko baş nêbi; namê lajekî Kîm bi û belkî berpirsiyarîya eyî ma zaf erey grewtibi xo ser ya zî çîyêko winasî. Mektûbêka ma rê amî de behsê sebebe mergê eyî nêamebi kerdiş la ma rê peşniyaz kerdibi ke ma domanêko bîn sey ewlat weçînim û taye nimûneyê balkêşî ma rê rêşawitî la zerrîya ma nê rê razî nêbî ke ma yewî biweçînim. No hedîse sinife rê zaf gran ame. Înan de hîssêko neyênî virazya û hêdî hêdî (her çiqas yewî mi dir no fikrê xo bar nêkerdebo zî) fikirayî ke beno ke na mektebe de problemêk esto. Labelê ez wina nêfikiryena, bi taybetî wazena vacî, mi tay çiyê başêrî û tay çiyê xirabêrî tiya de tecrube kerdîbî. Tenê tay bêsiûdî pêsero varayî. Mesela humarêka îstîsnayî ebeveynan dinyaya xo bedelna. Ez vana qey di hebin krîzê qelbî derbas kerdibi, di hebin xo kişt, yew fetisya, û qezayêkê trafikî de çar merdimî piya merdî. Yew zî hedîseyê felcî virazya. Û beynatê kalikan û pîrikanê ma de xora herkes mûsayê humarêka berz bi meselê mergî de; beno ke emser humare hîna zêde bî, wina aysê.

Û nîhayet trajedî amî.

Trajedî gama Mathew Wein û Tony Mavrogordo'yî cayêko seba însaatê bînayê Hukumatê Federalî erd amê kene de kay kerdê virazya. Şima zanê, kalekê cayê kendişt de kîrîşê darênî yê pêser eşteyî estê. Nê serebûtî ser

dewayêk abena. Mayî û Pîyî îddîa kenê ke nê kîrîşî bi awayêko ewle nêamê îstîfkerdene. Ez nêzana çî raştî çî raşt niyo. Serrêka ecêbe bî.

Mi kerd xo vîrî ez behsê babê Billy Brantî bikerî. Keyê xo de gama bi hêrîşkarêko bimaske dir yewbînan benê arenê, bi kardî derba mergî girewtibi.

Rojêk, ma sinife de munaqaşayêke kerd. Înan mi ra persa:

-Şî çî ca?

-Darî, Semenderî, Masê tropîkalî, Edgar, dadî û babêyî, Mathew û Tony.. Şî çî ca?

Mi zî va:

-Ez nêzana, nêzana ez.

Înan va:

-Kam zano?

Mi va:

-Yew nêzano.

Dima ra înan va:

-Çîyo ke manayêke dano cuye merg o?

Mi zî vat:

-Nê. Çîyo ke mana dano cuye, cuye bixo ya.

Nê cewabî ser, înan zî mi ra wina va:

-La merg, gama merdim fenê raştîyêko bingeyin bifikiryo, wasitaya tehamulkerdişê cuya rojane ya rêzera -ke na cuye bêpers yena qebûlkerdiş- nîyo û seba ke ma bi ê birisim ferqkerdişêkê estbîyayîşî û..

Mi vat:

-Ye, belkî.

Înan vat:

-Ma nê ra hes nêkerd.

Mi va:

-No fikrêko maqûl o.

Înan vat:

-Na niheqîyêka rezalet a.

Mi vat,

-Raşt a.

Înan vat ke:

-Ti êşkenê Helene dir (Helen hetkarê mamosteyî ya) şa bibê, ma zî bivînim merdim senîn şa beno? Ma zanê ke ti Helene ra hes kenê.

Ez raştî zî Helene ra hes kena la mi va ke ez te dir û tiya de şa nêbena.

Înan vat ke:

-Ma serê şabiyayîşîya ya zaf çî şinawito la ma qet nêdîyo.

Mi zî vat;

-Seba na yewe ez êşkena kar ra bêrî eştîş û nê tewr çî -ya çî rey, ya zî hema vac çî rey- seba şovî nînê kerdiş."

Helen nîyada şibake ra.

Înan va ke:

-Keremê xo rê, keremê xo rê Helene dir şa bibe. Ma rê yew nîrxêko biqîymet lazîm o. Ma tersenê."

Mi zî vat:

-Şima ganî nêtersê (Her çiqas ez zî zaf rey tersena), qîymet û erjî her ca de estê.

Helen amî verê mi û ez verar kerda.

Mi zî çend reyî çarê aye maçî kerd.

Domanî zaf kelecânî bî.

Dima ra ber da pero. Mi akerd, û Gerbîlo newe ame zere.

Domanî keyfan ra erzîyayî pay û dest bi çepikan kerdî. ●

Îngilîzkî ra: Netîce Altun Demir

# Fabián Espejel

## Xofo

Çeşinî qetmaxeyek janî birrabê  
yan hemû şarêk darrmabê  
desttim biderê

Çeşinî bahozê  
xoy le xizîy kevir hellbiswê  
desttim biderê

Çeşinî herremê bixwazê çirrnûk le hewa bigrê  
çeşinî paporrê dem rûbar bilawênê  
desttim biderê

Debînîn çon kevir lêk detrazê  
çon aw wişk debê û  
ewey karîte raygirtwe Leser zewî denwê  
êsk be êskîş Leser limellan oqre degirê

Desttim biderê  
çeşinî bêdengî le xîştî şikaw bixşê  
debîne diwahemîn kevir ke bikewê  
ke şew dadê

Wergêranî le îspanîyewe: Jiyar Homer

‘Fevzî Ozluçer

# Ji Siya ‘Dara ‘Hinarê ‘Heta Govenda ‘Rengan: ‘Di ‘Hunera Sevgî Sariyildiz de Jin, ‘Bîr û ‘Berxwedan

Huner carinan ji koka axê, ji heriya zarokatiyê heşîn dibe. Ji bo Sevgî Sariyildizê ev rêwîti li Cizîra Botan dest pê dike; li wir, ew bi pênc xwîşkên xwe re di nav baxçeyekî fireh de mezin bûye. Di nava avahiyeke malbatî ya pederşahî û erdnîgariyeke qedîm de; avakirina xaniyên biçûk û figuran ji heriyê ne tenê listikek zaroktiyê bû; ew gavê pêşîn ên hewldana wê ya avakirina cîhana xwe ya taybet û nasnameya xwe bû. Di salên zarokatiyê de, li bin dara hinarê ya nav baxçeyê, li ser kevirê mezin ku xewnên xwe lê ava dikir û pirtûk dixwendin, bingeha pratîka wê ya hunerî hat danîn; pratîkeke ku îro li Mersînê di bin banê “Atolyeya Ekoton a Hunera Kolektîf” de bi reng û tûwalê re jiyanê dibîne.

## Gerokek li Sînoran: Têkoşîna di Navbera Kevneşopî û Nûjeniyê de

Sevgî Sariyildiz hunermendek e ku her du cîhanên “dijber” di ruhê xwe de bi hişmendî hîs dike û hunera xwe ji vê pevçûnê diafirîne. Li aliyekî jiyan û kevneşopiya Cizîrê ya ku di nav gelê Kurd de cihê xwe yê kûr heye; li aliyê din jî dînamîkên bajarê modern ê wekî Mersîna ku bi koçê teşe girtiye. Ev her du cemser di cîhana hunermendê de ne sedema perçebûnê ne; berevajî wê, sedema geşbûna tansiyoneke hunerî ya dewlemend in. Perwerdehiya wê ya felsefeyê ya li Zanîngeha İnönüyê, alîkariya wê kirîye ku bi mesafeyêke analîtîk û rexneyî li vê têkoşîna di navbera kevneşopî û nûjeniyê de binêre. Ew firçeya xwe ne tenê li boyaxê, li pirsên kevnar ên ku felsefe dipirse jî dixê û li civak, nasname û sînoran dipirse.



**Veguhestina Zehmetiya Jinbûnê bo Berxwedanê: Diyarkirina Nediariyê**

Di tûwalên Sariyildizê de jin ne tenê figureke estetîk an jî objeyeke ku tê temaşê kirin e; ew xwedî rol e, berxwedêr e û dibe mijara sereke. Hunermend hemû zehmetî, zext û barên jinbûnê di berhemên xwe de vediguhêze û ji wan qadeke berxwedêr tîne pê. Jinbûn û keda jinê ya ji aliyê pergala mêrane û pederşahî tê veşartin û nediyarkirin bi rêya wêneyê diyar dike û ev yek wek mîsyona hunerî ya bingeşîn digre ser xwe.

Bêguman ev dorpêça pederşahî ne

tenê çîrokeke taybet a Cizîrê an jî deverêke din e. Ew di nav cîhana hunerê de jî, ku xwe pêşketîtir nîşan dide, bi hiyerarşiyên nazik û veşartî û bi awayên serdestiyê yên ku dixwazin cesareta hunermendiya jinê bişkinin, didomîne. Ji ber vê yekê xetên di wêneyên Sevgiyê de tenê zelal û tûj nînin; di heman demê de gelek tîr û şidandî ne. Çavên figuran dibiriqin, ji ber ku hişyariyek entelektuel di xwe de dihevin; lê di heman demê de xwe navberek hene, ji ber ku li hember van awayên serdestiya elitîst û sazûmanî redkirineke bêdeng dinehwişin.

**Nimandinên Dîtbarî: Pesnê Esmeriyê, Derazînk û Navgîniya Moriyê**

Bîr û xêv bingehên herî xurt ên vê lêgerîna xuyaniyê ne. Dema ku em li portreya jineke pîr a ku qonaxa pêşketî ya hunermendê nîşan dide (“Bênav”) dinêrin, rastiyeke erdnîgarî û çandî ya ku nerînên oryantalîst û yekrengker berrevajî dike li hemberî me radiweste. Ev berhem pesnek balkêş e ji bo Kurda kej û pesnê esmeriyê ye. Porên spî / zer û çavên ronî yê jina di wênêyê de qalibên nasnameyê yê “stereotîpîk” dişkînin; rengên axê yê qemerî ku di destên wê, textê darîn ê ku li ser rûniştîye û paşxaneyê tarî de serdest in, rêzgirtineke kûr e ji bo koka kevnar û berxwedêr a esmeriyê. Ew valahiya kûr a ku jin lê dinihêre, mîna qîrîna bêdeng a sed salan û çîrokên nehatine gotin e.


Di berhemeke din a balkêş de (“Derazînk”), em rastî figureke jineke ciwan tînin ku li derazînkê ye. Dîwar bi tekstûra

‘Ew di nav cîhana hunerê de jî, ku xwe pêşketîr nîşan dide, bi hiyerarşiyên nazîk û veşartî û bi awayên serdestiyê yê ku dixwazin cesareta hunermendiya jinê bişkînin, didomîne.



xwe xaniyên kelpîçî yê zarokatiya Sevgiyê yê li Cizîrê tîne bîra me. Ev derazînk nîşana derbasbûna navbera cîhana malê ya kevneşopî û qada civakî ya nûjen e; ango bi temamî qadeke “ekoton”ê ye. Helwesta wê ya rast, bê tavidan û meydanxwaz, bersiveke wêrek e li hember wan awayên serdestiya veşartî ku ji cîhana hunerê heta avahiya civakî belav bûne. Xet gelek teng in; çavên figurê dibiriqin û hişyar in, lê ew navbera ku di navbera xwe û temaşevan de dihêle, her nihêrîna ku dixwaze jinê bike obje li derve dihêle.

Xebata Sariyildizê ya bi awayekî herî radîkal tîkiliya nihêrîn û serdestiyê berrevajî dike, portreya bi navê “Yên di Binê



‘Ev moriyên ji tariya cilan,  
yanî ji binerdê, ji bin xweza  
û bîra tepisandî derdikevin  
ev çavê rasyonêl ê wer  
dizane ku her tiştî dibîne  
vedixwînin tariyeka  
misoger û dalanên veşartî  
yên ax û xwezayê.

Demê de Mane” ye. Çavê birqokî û şîn  
ê dike mirovî hîpnotîze bike di hundirê  
xwe de xwestekeka qurre ya dîtîne -ya  
wer difikire ku serdestê mekan û figure  
ye, di hewîne, di bîra temaşevên de wer  
dide hîskirin ku her tiştî dibîne. Lê ji bin  
vê biriqînê ber bi stûyê jinê ve hilkişîna  
moriyên bi ser çermî ve dest pê dike. Ev  
moriyên ji tariya cilan, yanî ji binerdê, ji  
bin xweza û bîra tepisandî derdikevin ev  
çavê rasyonêl ê wer dizane ku her tiştî  
dibîne vedixwînin tariyeka misoger û  
dalanên veşartî yên ax û xwezayê. Morî  
mîkro-berxwedaneke organîk e ku ji jêr  
û ji axê tê û li hemberî çavê hiyerarşiyên  
pederşahî yê ji nava xwe razî rabûye. Ro-  
nahî îlluziyonek e li vir; heqîqeta rastîn  
ew heqîqet e ku di wê tarîtiya zana û  
bêyom de veşartîye, ya ku morî me ve-  
dixwîninê.

## Encam: Silava Kesayetiya Kolektîf a li Dijî Kesayetiya Razber

Wêneyên Sevî Sariyildizê li şûna ta-  
kekesa ji cîhanê îzole, bêkontekst û raz-  
ber a Rojavayî, silavê li takekesa kolek-  
tîf a berê xwe daye tevî û tevahiyê dike.  
Fîgurên di tuwalên wê de jîn dibin, ne  
sêwirên razber in; her yek ji wan xwedî  
kontekst, welat û derdekî kevnar e. Ew  
takekes di heman demê de hem jin,  
hem Kurd û hem jî xweza bi xwe ye. Sa-  
riyildiz zehmetiyên jinanî û cografayê  
nake biresera keserê, wan vediguhêze  
qadeka berxwedanê ku bi firçeya xwe  
aniye pê. Ev serpêhatiya ku ji pêşan-  
gehên “circular” heya pêşangeha “Rê”yê  
ya li Amedê domandiye û bi xelatên di  
sala 2026an de wergirtine tacîser bûye,  
di eslê xwe de olana vî dengê kolektîf  
e. Ev dengê ji Cizîra Botan bilind dibe,  
îro, bi giştî û tevahî ji evîna hunermendê  
bi xwe, bi neqşên ji gewherî û dilêriya  
firçeya xwe ve, bi diyarkirina rengên ne-  
diyarkirî ve bûye helbesta berxwedanê  
ku hê jî tê nivîsandin. ●

### Wêne:

1. “Bênav”, 100x120 / Teknîka têkel li ser tuwalê; dims û ka; dims ji bo zeliqandina kayê hatiye bikaranîn / 2026, Mêrsîn
2. “Derazînk”, 90x120 / Teknîka têkel li ser tuwalê / 2025, Mêrsîn
3. “Yên di Binê Demê de Mane”, 100x120 / Teknîka têkel li ser tuwalê; dims û ka; dims ji bo zeliqandina kayê hatiye bikaranîn, morî ji kilsê hatiye çêkirin û sê rehend in / 2026, Mêrsîn

Haden Oz

## Ti Ama

gunê re...

*"hewnê xo de mi hewnê to dîyo"*  
mehmet çetîn

hega û pagê mi kemer û kuç bî  
derê derxanê mi ra awki ancîyaybî  
royê mi ze bome dormê xo di fetelîyene  
raya xo şaş kerdîbî, xo şaş kerdîbî  
dînya mi tarî bî, vengê mi bêveng bî  
zonê mi wertê zonan de vilê çewitî bî

ti ama hega û paganê mi ra  
kemer kuç da arê gul û sosinî ramîtî  
varis varna dere û derxanê mi xurxurîyayî  
gonya mi gîrî, royê mi eşqê to ra bî serxoş  
vengê mi zonê mi de reyna ama dînya

ti ama tîjam, usar ama, dînya mi bîye roşt  
ti ama, huyayîşê to ama, royem bî haşt  
ti ama, çimê ti ginay çimanê mi  
saeta zerrîya bella mi bîyê raşt  
ti ama vertê sar û yabanî de mi rêça xo dî  
ti xer ama waştîyam ti xer ama

## Guya Bêpeynî

I

rind yew çîyo  
ke, mordem nîdarkerdişê  
lêfanê mahşlêre bikero,  
erzîyaya yew dilbêre,  
hewtay û hewt serra,  
yew mahşlêre,  
wîna engûra xo zî nesalnaya  
teyr û tembûr, çarhing û zirqêt,  
şew roc wespawêtênî  
zik-ziwa mendinê goşeyo qaqûsê.

II

teyrêka neçara bêmcal zî,  
halên xo viraştibe mîyan hîrê  
şaxanê kevnaran de,  
yew mar zî, bibe veyşan rocan reyde,  
wêçwêçîya leyrekan ra mest bibe  
giran giran vêm danê xo, gil bi gil.

III

a vîste zî teyrêk dîvana homayan de bî,  
homay' xo bi xo fikêrîyenê,  
seba ke xo ra pûf kerdibe zinca însanê,  
fikirê xo wîna bi;  
gelo mi çi wîna yew çi xeleqna?

berzîn de zî aşêra xo bibî,  
yew vizzika awke ti ra zimmanê,  
teyrêke, nequra xo şonaye a wûte  
ha vacê; hinde hîrê dalpeyê,  
binê zonê xo de miqate kerdî.

#### IV

homayan xo mîyan de vatêne;  
na awa cuya bêpeynîya,  
teyrêk zî waştêne ke;  
bero bikero serê însanî,  
nêzdîyê halênê xo yî biqûrîçan ra viyartêne  
ke, mareko kil, xo pêşto gilo bizête,  
û hêd-hêd xo anceno mîyanê hîrê şaxan.

#### V

vaye reqsnena halên de pûrt û mûye,  
zerre de ha nalenê veyşanê ver, çar hebê,  
hima di roceyê, nika ha çûlîyê xo ser de,  
çar zêncîyê goştê,  
çimê xo padaye, û çûqune zî venge  
vaydayîşê vaye ver, erzîyayê pêser.

#### VI

teyrêk nîdar kerdê ke, heywaxo çî wax,  
qeseba xo çarexêyaye sey çêleyê adirê  
bi vengêko pêt wêçwêçay ha wêçwîçaye  
a vîste, awa cuya bêpeynî neqûra barê ra rişaye,  
sey yew varanê reşîşî ameye bîye hîrê çîyan,  
bîyê mar, mahşlêre û dara dilbêre ser de  
a roce ra pey nê heme hîrê hervîste, cîwan,  
tole erzenê nêbenê kevnar,  
la eke ruhê xo nêhesebîyo!

# Jamaica Kincaid

## ‘Keçik

Cilên spî roja duşemê bişo û wan deyne ser loda keviran; cilên rengdar roja sêşemê bişo û wan deyne ser benê cilan; li ber tava germ servekirî nemeşe; kekên kundirî di nav rûnê şêrîn ê pir germ de bipijîne; te hema çawa piştî ku ew xwe ji xwe kirin cilên xwe yên biçûk di nav avê de bihêle; dema tu pembo dikirî da ku ji xwe re blûzekî xweşik çêbikî, piştrast bibe ku apre li serê tunebe lewre bi vî awayî qumaşê wê piştî şûştinekê dê bidedime; masiyê xwêkirî bi şev di nav avê da bihêle berî ku tu wî bipijînî; gelo rast e ku tu li dibistana yekşemê stranên benna<sup>1</sup> dixwînî<sup>2</sup>; hertim bi awayekî wisa xwarinê bixwe ku dilê kesî pê nexele; rojên yekşeman hewl bide ku wekî xanimekê bimeşî û ne wekî qûndeya ku tu gelekî meyldar î bibî; li dibistana yekşemê stranên benna nexwîne; divê tu bi wan lawikan re nepeyivî ku wekî cirdoneyên keştîgehan in, hetta ne ji bo terîfkirina rêya ciyekî jî; li ser rê fêkiyan nexwe- mêş dê bi dûv te bikevin; *lê ez tu carê stranên benna rojên yekşeman naxwînim û li dibistana yekşemê jî qet wan naxwînim*; divê tu aha wisa bişkokekê bidirûyî û divê tu aha wisa qulikekê ji bo bişkoka ku te dirûtiye vekî; divê tu aha wisa kêleka cilekî bidirûyî dema ku te dît kêleka wî diqete û da ku tu rê li ber xwe bigirî ji bo ku tu wekî qûndeya ku ez dizanim tu gelekî meyldar î bibî xuya nekî; divê tu aha wisa îşligê bavê xwe yê bi rengê xakî utî bikî ji bo ku qermiçî xuya neke, divê tu aha wisa bamiyan biçînî- ji malê gelekî dûr, ji ber ku dara bamiyan moriyên sor dihevine; dema ku tu taro<sup>3</sup> diçînî, piştrast bibe ku ew têr avê vedixwe yan na dema ku tu wî dixwî dike ku qirqa te bixurê; divê tu aha wisa qorziyekê rêş bikî; divê tu aha wisa tevahiya malekê rêş bikî; divê tu aha wisa hewşekê rêş

<sup>1</sup> stranên Kalîpso.

<sup>2</sup> Kalîpso terzeke muzîkê ya gelêrî ya kevneşopî ye ku ritimên Efrîkayî û Karayîbî li hev dicivîne. Ev terza muzîkê bi eslê xwe ji Trînîdad û Tobagoyê ye (têbiniya wergêr, t.w.).

<sup>3</sup> Bi navê xwe yê Latînî “Colocasia Esculenta”, yan jî di Îngilîzî da “Dasheen”; giyayekî kok ê tropîkal e ku xwemalî Asyaya Başûr-Rojhilat e (t.w.).

bikî; divê tu aha wisa li kesekî ku tu zêde jê hez nakî bikenî; divê tu aha wisa li kesekî ku tu qet jê hez nakî bikenî, divê tu aha wisa li kesekî ku pir jê hez dikî bikenî; divê tu aha wisa maseyekê ji bo çayê amade bikî; divê tu aha wisa maseyekê ji bo şivê amade bikî, divê tu aha wisa maseyekê ji bo şîva bi mêvanekî/e giring re amade bikî; divê tu aha wisa maseyekê ji bo firavînê amade bikî; divê tu aha wisa maseyekê ji bo taştê amade bikî; dema ku mêr li dora te hebin divê tu aha wisa tevbigerî, û bi vî awayî ew dê yekser qûndeya ku min li dij hişyarî da te nas nekin; piştrast bibe ku tu her roj xwe dişoyî, hetta bi tûka te bi xwe be jî; ji bo ku tu bi xaran bilîzî çok venede- tu ne kurik î, tu dizanî; kulîlkên mirovan jê neke- dibe ku tu bi nexweşiyekê bikevî; keviran neavêje çivîkên reş<sup>4</sup>, çunkî dibe ku ew qet ne çivîkekî reş be jî, divê tu aha wisa pûdînga nan çêbikî, divê tu aha wisa dûkona<sup>5</sup> çêbikî, divê tu aha wisa tîrşika îsotan<sup>6</sup> çêbikî; divê tu aha wisa dermaneke baş bo sermayê çêbikî; divê tu aha wisa dermaneke baş bo avê-tina zarokekî çêbikî hetta hê berî ku ew bibe zarok jî; divê tu aha wisa masiyekî bigirî; û divê tu aha wisa masiyekî ku kêfa te jê re nehat car din biavêjî, û bi vî awayî tiştêkî xerab dê neyê ser te; divê tu aha wisa zorbaziyan li zilamekî bikî; zilamek aha wisa zorbaziyan li te dike; divê tu aha wisa ji zilamekî hez bikî, û ger ev bi kêr neyê rêyên din hene, û ger ew jî bi kêr neyên ji bo devjêberdanê pir xirab hîs neke, û divê tu aha wisa tîfî hewayê bikî ger dilê te vê yekê bixwaze, û divê tu aha wisa zû tev bigerî da ku tîfî neyê ser te; divê tu aha wisa debara xwe bikî; hertim nan biguvêşe ji bo tu piştrast bibî ku ew teze ye; *lê ger ku firûnvan nehêle ez nan hîs bikim?*; yanî tu dixwazî bibêjî ku piştî her tiştî, tu dê bi rastî bibî ew cure jina ku firûnvan dê nehêle xwe nêzîkî nan bike?

1983

Wergera ji Îngilîzî: Aydın Ekîn

Çavkanî: Charters, Ann, Ed. *The Story and its Writer: An Introduction to Short Fiction*. 6th Ed. Boston: Bedford/St. Martin's, 2003.

<sup>4</sup> 4 Li vir qesda nivîskarê, cureyekî ji çivîkan "blackbird" yan jî bi navê xwe yê latînî "Turdus Merula" ye.

<sup>5</sup> 5 Dûkona, yan jî bi navê xwe yê îngilîzî "doukona", şêraniyeke kevneşopî ye bi taybetî li giravên Karayîbê (wekî Antigua û Jamaica) (t.w.).

<sup>6</sup> 6 Li vir qesda nivîskarê xwarina bi navê "pepper pot" e; xwarineke xwemalî ye ku aîdî Karayîban, bi taybetî Gûayanê ye.

## II. Dewlet û Kulîlk

Sûretên diltezên in radiwirin di ber deriyên zêhnê ra;  
 Şeva Krîstal *opnieuw*. Riya qîr çivan dide xwe, hê jî winda dibe  
 Di nava mija tenik e l' ser serê warxanên xweragir ra;  
 Berçileya 1999an, qewmê agir û tofan, xût xwelî l' hewayê,  
 Colî ser serê hev dibe, j' mirinê ti *tutar*, Lo, tê da nemayî;  
 Dewlet û Kulîlk: senger qewî hêdî diperise: "Ciya min Kurd e!"

Doçikên Romê qewî dûr in ji doçkayên li serê çiyayên tûrre;  
 Çik û tîk in li nava mêşeyên darberûyên bê porik li bestê,  
 Dixwînin meydan û fermanê j' Kurdistana tijî-şeqeloz ra;  
 Çirayên binevî dadidine devên qelşan, berehan û şikeftan,  
 Têjikên Gurê Manco serên xwe şorrî nava xweliyê dikin;  
 Dewlet û Kulîlk: senger qewî hêdî diperise: "Ciya min Kurd e!"

Kûçikên dirrinde ne pencên xwe d' deşt û çiyayan radikin,  
 Deriyên ez gurm ha gurm dikutim hemû dadayî ne,  
 Ez î tak û tenya, her du piyên xwe daxistî ava şorr a kendavê;  
 Masiyên namo yî kara qîllên xwe yên tenik davêjinê,  
 Binçengên xwe yên sist rast dikan bi qirtikên piyên min;  
 Dewlet û Kulîlk: senger qewî hêdî diperise: "Ciya min Kurd e!"

Kenê zalimane dibişkive l' sifetê min ê pê va gula xemnexur,  
 Malê û cîranan pev ra ez bi devê Topa Giran va girê dam,  
 Las û xelas, pirtî pirtî, li gulvedanê ye 'emrê xeniqî l' axûr;  
 Xeyala diltezên e avên tenik bixuşîne newalan em katî kazîwe,  
 Lo, dengên şa'irên yekserî-yekbêrî j' çarnikar da dipeqin;  
 Dewlet û Kulîlk: senger qewî hêdî diperise: "Ciya min Kurd e!"

Gelo ew kî bû hemasa dêrîname digot, "Dirrîne şîrê ciya xwe!  
 Hildidin bi gûzeka hev vedidin ça' ku ji ta û ba ketibin,  
 Weylo! heçku neçar in wekî hey rastî fisequran werin;  
 Piyaleya hezîn e bê rawestan saqî tîne, saqî jê diçîneve,  
 Heylo, deriyên Birca tahiran ji çar paran da hey direqin;  
 Dewlet û Kulîlk: senger qewî hêdî diperise: "Ciya min Kurd e!"

# Lorîn Demirel

## Dema Nêzanîye de

### Nika –I–

Çi ke qedexe bîya, xeyalê ey û saye, xeyalê fetilnayîşa  
 ‘Havva û ‘Adem î. Saye, bedilnayîşê / vuruyayîşê  
 qehramankî ma rê vana.

*Sayê Marû*, kitaba Alî Aydin Çîçek a dîyînî ya. No kitabî de sanikanê Xînis û Tekmanî amo arekerdeyene. Mi ra gore, giranîya na sanikan de fîgura Îslamî û rêça bawerîya pagane-Kurdî têdust de şona. Na rewşa de sanikane kî amo nuşnayêne, behsa prosesê “evolve”yê (teqamul) înan keno. Her sanika de yew cengî esta.

Yewîne de hîrî biraye ra qijkekî hem birayê bînan xeleşneno hem layîqa pîyê xo beno. Yewabîne de çerxa cuyayîşê dînya dimê luye de beno. Luyê serba dimê xo mucadele dano û çerxa cuyayîş na mucadeleye de vînemî.

Her gamî de her kesî muhtace yewbînî yê. Dînyayê na sanikan de cînîka kokimî û luyekê serba, şit û dime, munaqaşaye înan wanemî. Sanikan, mîyana kamjî şaran ra kî vejîyî rêça a komelkî ma re peşnîyazkena. Destê ma re kî ame, ma kî na reşan şima rê pêşkêş kemî.

#### “Saye”

Sanika yewîne, Qoto, de hîrî biray ver ra saye weno û peyra kî merdimokê cuyayê înan vurneno ey naskenî. Berdan û Zelîxanê de, bêdomanê di biray estî û merdimekê kokimî înan ra yew saye dana. Vana lêteyî şima borî, lêteyê bîn kê biderî



cînîyanê xo. Şima ra yew domon beno. Yewî kênek a û yewî lajêk o. Na kêneke û lajekê ke bî pîl zewecînî.

Tîyade bimanaya xeyalî ke nîyade-me vîneme ke “saye” prosesê estîyayîşa ruhî ra ma beno prosesê estbîyayîşa bedenî. Çi ke qedexê bîya, xeyalê ey û saye, xeyalê fetilnayîşa Havva û Adem î. Saye, bedilnayîşê / vuruyayîşê qehremanî ma rê vana. Xapandina qehremanî û dima ra ke vuruyayîşê qehremanî ma rê asan kena.

Sanika Berdan û Zelîxanê de “saye”, virendê lêteyê saye dima yewîbîyayîşî ana ma vîr, a ke yewbîn kena yew, xeyalê a ya. Sanika Feqiyê Teyranî de Feqî saye ke werd, eşka xo vînena. Sanika Rojawayî de, Prensese Pamûk û Heft Cuceyî, saye manaya vuruyayîşê cuyayîş de ra.

Peynîya her sanikan de hewa ra hîrî sayê ginena warî; yewî kamkê sanikê vata ey re, yewî goşdaranî re û yew ke wayirê sanika bo, vanî.

Yew vateyê verenanê Tirkî de vano “kamke gure û qezanç kerd sayê xo beno sûrî”, peynîya gureyayîşa de xelata şima, e kî gureyî, yew saya sûr a. Logoyê Apple de saya gezkêrdene esta. Na logo mîtolojî ra bawerîya paganî, bawerîya paganî ra bawerîya Heqa yewitîyê, nazara ke berardîşê berhemê teknolojîkî û rotena na markayê na berhemî, evolveyê xeyaleyê sayê ma re vana. Na logo xeyalê yew tercîh a. Çitur ke peynîya sanika de hîrî saye gineno war. Na sayan ra yewî kamkê vano ey re, yewî goşdaran re û yewî ke wayira sanikê re yeno dayêne, Apple ke zereyê sîstema kapîtalîstî de kamke baha û biqalîteyê wazenî serba înan yeno pêşkeş kerdene.

Quranî de yeno vatene kê, “Eke şima ke saye werd hetê zalîmî ra benî.” Hav-

Reyna sanika de Sayê  
 Marû kene hîrî lete, eke  
 awe ke girîna kefa verenê  
 axûya, kefa dîyîne sirrê  
 Loqman o û kefa hîreyenê  
 dermanê derdan o.

va û Ademî ke saye werd kamjî cînse  
 ra bîye ey fam kenî. *Încîlî* de dara saye  
 xeyalê zanayîşa rind û xirab a. Reyna,  
*Tevratî* de saye xeyalê zanayîşa rind û  
 xirab a. Mîtolojîye de Herakles, Atlasî  
 îkna kena û Baxçeya Kênayanê Şewe  
 ra hîre sayî ana.

Ma kê cor de serba, nê perûnan  
 ame verê çîman û mîtolojî de, bawerî-  
 ye de, heta kê cuya modernîya dema  
 ma de saye; xeyalê xelat, vurîyayîş û  
 estbîyayîş a.

### “Mar”

Her deme de serê maran de yew  
 sanike, efsane û mît esta. Şeytan kê  
 cennetî ra ama fetilnayîş destê marî ra  
 saye dana Havva û Ademî re. Nîşana  
 zanyarî ya tibbî kê mar a. Dema mîto-

lojîye de mar, elçîya/qasîda pawitoxa  
 Îştar a. Dema Neo-Asûr û Neo-Babîlî  
 de mar, temsîlîya heqê Nîrahî kena.  
 Mar, Sumerî de nîşana Enkî yê. Fîra-  
 vunî Misirî nîşana mara mertalî nanero  
 serê sarê xo. Dema modernî de honde  
 îmaja xo ye xirabîye esta labêle mar,  
 nîşana adira cuyayîş û zanayîş a.

Sanika “Sayê Marû” de, Sayê Marû  
 têde zanayîşa dînyayî zonena. Hatta  
 sanike “Sayê Marû belkîya lazê Loq-  
 man Hekîm o” ra destpêkeno. Bi tesa-  
 dufî Camisan cayê Sayê Marû miseno,  
 serba Camisan kê “Coka vanê Sayê  
 Marû belka lazê Loqman Hekîm, Ca-  
 misan bi xo yo” ra qedîno. Reyna sa-  
 nika de Sayê Marû kene hîrî lete, eke  
 awe ke girîna kefa verenê axûya, kefa  
 dîyîne sirrê Loqman o û kefa hîreyenê  
 dermanê derdan o.

Nîşanê maran her kulturî de xo re  
 ca dîyo. Serba Elewîya kurdan mara zî-  
 yaretan / jaran sey jar / zîyaretî pîroz a.  
 Ezîdîyan de, çêbera mozolayê Şex Adî  
 de, hetê rast de nîşanê marî esta. Mar;  
 mîtî de, efsaneyan de û sanikan de xo  
 re rind û xirab ca dîyo. Mekanê cayê  
 pîrozan de mar, wezîfeyê pawitoxîya  
 olîyan kerdo. Dema modernî de îmajê  
 maran zaf rind nîyo, seke ma cor de va,  
 maran nîşana adira cuyayîş o. ●

Luis Gernuda

## Ligel te

Axa min?

Axa min tu yî.

Gelê min?

Gelê min tu yî.

Sirgûn û mirin

ji bo min li cihekî ne

ku tu ne li wir î.

Û jiyana min?

Ka bêje ji min re, jiyana min,

ma ew çi ye, heke ne tu bî?

*Wergera ji Îspanyolî: Jiyar Homer*

# Margarete Beutler

## Gava ‘Min ‘Dev ji Odeyekê ‘Berda, ya ku ‘Min ‘Jê ‘Hez ‘Dikir

Tu odeya hezkirî, êdî divê em dev ji hev berdin!  
Ji pencereyê ve şaxêngula zirav silav dide  
Careke din wek hizreke bextewar  
Ji rojên, ku min tevahiya xwe didanê.

Tu aramî bûyî! Dîwarên te yên nazik.  
Bîra tarî ya ruhê min di nav de xwe hildigirt;  
Ji nav çavan sarbûn û ronahî diherikî.  
Ji pencereyê ve ber bi herêma herî xweş ve:

Li wir çem bi wêrekî di nav bêdengiyê de xwe hildavêt,  
Li wir ba ahenga stranên min dinivîsand.  
Di pirtûka spî ya dara “holunderê” de,  
Û hemû rengên havînê yên pirreng bûn ên min.

Niha mirovên çawa êdî wê piştî min werin?  
Ewê ji ruhê te têneghijin,  
Û wê bedewiya hestek sar bibînin,  
Ji ber ji zû de ye ronahiya jiyane ji wan hatiye standin. –

Ax, ku em helbestvan nikarin,  
Tiştê temambûyî ya xwebûna xwe bi Ez wate bikin! -  
Tiştêk nû li ba dibe, zengilê naqosê lêdide-  
Tu odeya hezkirî, êdî divê em dev ji hev berdin!

*Ji Almanî: Asya Xerzan*

Mary Oliver

## Katê Merg dê

Katê merg dê  
wek wirçî birsî le payîzda dê;  
Katê merg dê  
dirawe direwşawekey naw cantakey derdehênê  
ta bimkirrê, ewsa cantekey wela denê

Katê merg dê  
wek sûrêje dê

Katê merg dê  
wek şaxeseholl be nawşanda dadexizê  
demewê hengaw binê benaw dergay pirr le binckollî,  
guman dambigrê:  
Daxo ew tarîkî û nûtekîye çon bê?

Her boye wek xwişk û birayetî  
derrwanme hemû şîtê  
zemenîş her wek kellkelleyek debînim,  
edebyetîş wek egerêkî dîke dadenêm,  
jiyan lay min gullzarêke  
her gullêkîş bonêkî heye  
hemû nawêkîş Leser zarim mosîqayekî nerme,  
hawşêwey hemû mosîqayekîş meylî bo lay bêdengîye  
her cesteyekîş şêrî dilêre, benirxe lem dinyaye.

Katê kotayî dê, demewê billêm be dirêjayîy jînim,  
demê bûk bûm, hîy sersûrrman bûm.  
Demê zawa bûm, dinyam xizandbuwe amêzm.

Katê kotayî dê, namewê le xom biprisim  
daxo le jyanimda hîçî taybet û rastim kirdbê.

Namewê miştumirr legell xomda bikem  
yaxud ax hellbikêşm û tiris dambigrê.

Namewê her wek raguzerê  
çawm bem dinyaye kewtibê.

*Wergêrranî le Îngilîzîyewe: Dîna Sîrwan*  
*Tîpveguhastin: Jiyar Homer*

# Noëlle Revaz

## Çawerrwanî

Em sall bûmete hejde sall. Daye rojêk gutî eme ta rradeyek temenî şû kirdine u min çawerêm. Bawke êjê mirov bo hellbijardin çarî naçare, debêt çaw le rrê bêt; çima kesêkit pê şik dêt otombêlêk bikrrêt u em law ew la, hemû şiwênêk sengû sûjin nedat bo ewey be hendêk bar da hellî bisengênêt, nekewête berawird u be encamp negat, kesêk heye le baştirîn hellnegrêt?

Kewate çawerrê demênimewe.

Le estawe hendêk kiç denasim ke mêrdiyan kirdiwe. Rriwalletêkî ciyawazyan nîye, hêştas dillxoş u rrazîn. Wek çon min dellêm babe yan daye, ewan dellên mêrdekem, le katêkda be tenya dejîn... mebestime billêm be bê dayik u bawkiyan. Eme boy heye tirsêner bêt, bellam wa diyare mirov rradêt u tenanet çûne serdanî dayik u bawke pîreket be mebestî demeteqê legellyan debête mayey bêzarî katêk le mallî xot binemalle yan mêrdêk heye ke çaw le rêtin.

Hemîşe mayey hepesane wextêk kiç şû deken: le hîç nakewîte gumanewe, tûş-yan debêt, rûxoş u qij dahênraw, wekû caran, be bê ewey hest bikeyt xerîkî amade kirdinî rêwresmekî şayîn. Şitêkî heta billêy le nakaw u be taybetîş çawerrwan neki-rawe! Katêk qoll be qollî mêrdekanyan le killêse dêne der, bayekî hepesan be ser serî hemûyan da helldekat: jinan terr u taze u be baqûbirîqin u diwa car zawaş dête ber çira! Kes nazanêt le kiwêwe hatiwe. Diyare be nihênî dozîwyanetewe u ta rojî xoy le mallekanyan da şardûyanetewe. Ewey haşa hellnegire eweye ke hergîz kes lêre neybînîwin: berdewam komellêk piyawî qoz u gencin, xowllatî nîn. Naza-nim ew jinane le kiwê be destyan dehênin: mirov ew piyawane nabînêt ke dên, dena emînîş daneyekim bo xom gil dedayewe.

Pêwîste çawerrê bît.

Le mallewe şiwênewarekanî zemawend bedî dekrên: mebestim wênekanî babe u dayeye, ewîş katêk genc bûn u pêş ewey min bême dinya: axir zemawend

bo eweye mindall binêytewe, bellam babe u daye, wek xoyan êjin, bextyan nebwe, bêcge le min, mindallî tiryaniye. Bo dilldanewey xoyan, dehêllin Jêralld, madam dirawsêy yektirîn, bêtemallman.

Jêralld herçende qellewe u zor areq dekat, bellam hawrrêyekî başe bo min, axir hawtemenime u pêkewe çûynete qutabxane. Êsta, ke gewre bûyn, dîsan yektirî debînîn, leserrahatinekanî xoman berdewamîn. Jêralld kem ta kurtê wek birayek waye, ba zor zît u ziringîş nebêt u bitwanî wayş bikeyt birrwa be hemû şîtêk bihênêt.

Diwênê, be nimûne, bedem nîşandani wênekanî zemawendî daye u babewe gutim:

“Temaşay min bike lem wêneye da, pêt waye be jêr tarawe ciwanim?”

Çawekanî derperrîn u hawarî kird:

“To zemawendit kirdiwe?”

Gutim:

“Bêguman, netzanîbû?”

Dîsan hawarî kird:

“Diro dekeyt!”

Paşan em qiseyey be babeş gut ke dirokey piştrast kirdibwewe.

Jêralld kurrêkî zor çake. Hezî le pêkenîn u cefenge, bo ew hîç ciyawazyekî nîye ke eme le ser hesabî xoy bêt yan kesêkî tir. Giring pêkenîne. Baş dezanim hendêk roj hen bew şêweye legellîda dilovan nîm. Sererray emeş, hemîşe dêt u lêm debête siplî la wirig!

Kiçêkî azeb, sirûştîye eger bîyewêt katî hebêt be tenya bimênêtewe u nuqmî dinyay xeyallan bêt, nexasme diway hevde sallî, katêk piyaw dêne xiwazbênî. Debêt wênayan bikat u serî pêyanewe qall bêt. Min le baxçeke xewnyan pêwe debînim.

Daye u babe be darî serû, komelêk hewz u nîlûperrî kêwî, baxçeyekî ciwan u çawrrakêşyan pê geyandiwe, dar xurmayekîş le naw baxçekeye. Xaniweke bem şêweye legell dewrû berîda deguncêt, zorîş dillgîre, gullbaxî u sipîye u pencerekanî rûn u şeffafin.

Be zorî le ser kursye lakêşeyyeke dadenîşim u zor caranîş, her lewê Jêralld beserimda dêt. Be piştewe da lêm nizîk debêtewe, destekanî le ser serim dadenêt u yek be xoy dellê; Boo! Eminîş be dem qaw u qîjewey radeçllekim u hawar dekem birro milt bişkêne! Derrwat u wa denwênê ke pêdekenêt herçendeş be layewe esteme, pejiwanîş debim, bellam başe boçî bem core lêm nizîk debêtewe? Zendeqim deçêt.

Hewill dedem mêrdekem bihênime xeyall u bizanim le çi deçêt. Rrenge kelleget u qij kall bêt. Le ser gelalayekî sadey darêk, ta ser lêwarekan çaw bo demareakn degêrrît: ewende bese wêkyan bihênîtewe u mêrdeke emşew dêt. Eger bitwanim be qamkekanim çiwarçêweyek dirust bikem

bo ewey lêyewe le xanweke birrwanim, be bê ewey şitêk çûbête derewe, zor baş debêt. Çiwarçêwekanî pence-reke kitûmit lêk deçin u katêk pêweyan dedemewe, tenya çîwar goşeyek pêk dehênin, eme nîşaneyekî başe bo dahatû. Bellam daykim bangim dekat. Sê car leser yek nawim dehênê: piyaweke ciwan debêt. Carêkî dike nawekem pate dekatewe: piyaweke tokme u qijkall debêt.

Bawke dezanê zawa kêye. Deynasêt.

Leber xoyewe pêdekenêt u dellêt:

“Katêk hat xot dezanî kêye!”

Bawke hez dekat le ber dem pencereke, lew şiwêney mirov hewzekanî lêwe diyare, le ser moblleke pall bidatewe u bixwênêtewe.

Katêk meylêkî agirîn be serimda zall debêt, lêy depirsim:

“Başe key dêt?”

Wellam dedatewe:

“De carê çawerrê be, hênde bê oqire mebel!”

Paşan be pencereke da le derewe derrwanêt u berdewam giwêm le yek rriste debêt:

“Adey bizanîn dêt... nexêr, hîç nabînim.”

Rrojêke wek rrojanî tir: beyanî, hawîn, germayek ke be tanûpoy ba rrêsrawe. Mêrûlekan hemûyan xerîkî karin u şillejawin. Deçim daye rrademûsim, ewsa babeş rradeûsim. Ewan emrro heta billêy şadin, deyan-

bînim katêk çaw le çawî yektir debrin.

Daye dellêt:

“Baş xewtî?”

Depirsim:

“Çi rrûy dawê?”

“Oo...” derrwanête bawkim. “Çi hewayekî xoş u dillrrifêne!”

Bebe be tîley çaw be ser mêzeke da lêy derrwanêt.

“Pêy nellêyin?”

Daye pêm dellêt:

“Ewey rrastî bêt, em beyanîye miwanêkman hebû...”

Depirsim:

“Zawa?”

Ewca dillim we tirpe tirp dekewêt.

Babe be dem bizeyekewe lêm derrwanêt. Le çawanîda hîwa debînim, dillxoşe, çûnke diwa car dellêt:

“Ey çî, lewê ye, çawerrête.”

Hawar dekem:

“Başe kiwa, kiwanê?”

Babe bê ewey hîç billêt, le pencerekewe derrwanêt.

Dadegerrême naw baxçekewe. Rrûnakîyek le naw hewa da heye ke defrêrê. Be nêwan hewzekanda derrom. Hîç nabinim bicûllêt yan bilerêtewe. Dewrêkî dar serwekan lê dedem. Hîç bedî nakem. Bedem jimardinî tellaşekanewe be dewrî dar xurmakeda dexulêmewe, pencekanî pêm le naw aweke da dexûsênim, nîlûperrêk la dedem ke xerîke xo bewanî tir da bidat: le şepoldanî gellakan derrwanim;

gullebaxekan dejmêrim. Çawim be zawa nakewêt.

Tenya Jêralld heye ke giwêm le hatinî hengawekanî debêt, dêt u dest leser şanim dadenêt: Boo!... Her naştirsim. Eger zawake bigerrêtewe, pêwîste lêre birrwat. Wa nîşan dedem ke xerîkî piyasem.

Jêralld leser kursîyeke le cêyî xoy nabizwêt. Car care be layda têdeperim. Çemawetewe, destekanî le nêw rranekanîda lêk allandiwe, teplesere kemêk rûtawekey debînret. Jêralldî damaw! Natwanêt bibête mêrd. Xo eger nemnasîba, wek hawrrêş nemdewîst: rriwalletêkî gemjey heye, le dirêjxayenda mirov boy derdekewêt kurrêkî çend dilovane.

Hez dekem be naw darekanda bisûrremewe. Daye gelek gullî çandûn. Car care, be naw liqekanda çawim be Jêralld dekewêt, çûnke herçî bêt baxçeke biçûke. Mayey bêzarîye ke lêre demênêtewe. Rrengê zawakey rraw nabêt.

Diwacar le lay Jêralld dadenîşim. Dillim pirre: zawa rroyştiwe, çawerrêy min nemayewe. Hest dekem Jêralld be tîley çaw lêm derrwanêt u hest be xefetêk dekat. Kes nazanêt lem sateda çi deçêjim.

Babe le pişt pencereke xoy nîşan dedat bo ewey îşareyek bikat, rrengê bo ewey billêt: Serkewtû bît! yan: Dey!

Babe nazanêt ewey tir demêke rroyştiwe.


Jêralld hêşta lêm derrwanêt. Be niyaze şitêk billêt, bellam wişekan nayanewêt bêne ser zarî. Hest dekem areq dekat.

Dellêm:

“Jêralld damaweke, le ber em tawe memênewe, şellalî areq buyî.

Deçme jûrê, be pazde hengaw u dû şeqaw: zawake dêt. ●

*wergêrranî: Selaheddîn Bayezîdî  
Latînîzekirdin: Îbrahîm Şêxşerefî*



## Bi Garekê

bi carekê 60 sal derbas dibin bi ser tiştan re  
di mil û gopalên hev da hildikişin ser kolanê  
behsa hin hevalên di van rojan da mirine dikin  
yek dibêje:

“ka bisekinin hinekî”

yek garsonê Portugalî dişibîne kurê neviyê xwe  
kenekî serkî li bin devî

peyarêk mişt e bi artêşeka têkçûyî

yek dibêje:

“Mehmûdo jî bûye demans”

yek dibêje:

“kîjan Mehmûd?”

bi carekê 50 sal derbas dibin bi ser tiştan re  
hemû endamên komkarê di qehweya 43 m<sup>2</sup> da  
li maça Beşiktaşê temaşe dikin û belawela  
“tîma proleteran e” dibêje yê bi neh stendan dijî  
yek dibêje:

“carina şerab li diranên penîrokî nayê”

yek lê zêde dike:

“xwezil me suîkasta Celal Bayarî betal nekiriba”

yek bersiv didê:

“jina min a rehmetî rojê sê lître kola vedixwar”

û çay ji kîsê alîkariya sosyal

û reqî ji kîsê zarokên ji zû ve çûne Kenadayê

bi carekê 40 sal derbas dibin bi ser tiştan re  
Kurmanciya çemî pîrtir dibe li pişt dezgehê  
wisa kinik in ku gunehê meriv bi wan tê  
şûna tiliyên qermiçê li ser lehmeçûnan  
bi dorê derdikevin derveyî dikanê,  
ne cigare dikêşin ne li dûriyê dinêrin  
zawayê wan ê qirase ji dikana din tê  
bêhna keça wan a qot li ser rûyê  
Fransiyên kumsor ên bisebr li bendê  
diheyîrin û dibêjin, “olala” vê carê jî  
nihêrin vedigere, şev dadikeve ser deriyan

bi carekê 30 sal derbas dibin bi ser tiştan re  
dibêjin “sî w pênc milyon Ewro ye, salane, cîro”  
deşteka pahn di çavê wan da  
di pêçekê da xelas bûne ji Komkujiya Meraşê  
bi Tirkiyeka şikestî, dibêjin:  
“Selîm Bey, kiltur ûnemlî”<sup>1</sup>  
dixwazin telefuna Tirkekî ulusalcî peyde bikim  
da vexwînin wek mêvanê rûmetê  
kûr dibe rêya li ber restorana Libyayîyan  
û demançeyek tune di ber min de  
bankeya tabelaya xwe kesk kaseya xwe radide

bi carekê 20 sal derbas dibin bi ser tiştan re  
bîranîn û lehengiya şehîdan di hiş de  
dixwaze ji ciyekî mijarê biguherîne û bêje:  
“gava em ketin geliyê, hevalan amadekarî kirin”  
li vî bajarê ripîrast siya çiyê ye  
îman, ewrê kişiyayî ser bîbika çepê, tiliyên kêrn  
tenê tiştên jiyaye tên bîrê

---

1 \* “Selîm Beg, çand girîng e.”

ne ziman hîn dibe ne digere li bajêr  
dem derbas dibe di ber re  
berê wî dîsa li komeleyê

bi carekê 10 sal derbas dibin bi ser tiştan re  
piştî du meh heps û xebata “Komîsyona Dîplomasiyê”  
bi mafyaya Çeçenan re rûn didize ji Ukraynayê  
li gundê Vernaisona bi ser Lyonê pakêt dike  
markeya xwe ya “Zinar: Huile de tournesol” lê dixê  
û difroşe markêtên Erebb û Çewligijan  
şevên Înan diçe gaybarên Çînî yên Parîsa 13em  
û piştî du bîrayan dibêje:  
“Berzanî ji Apo çêtir e lo”

bi carekê 1 sal derbas dibe bi ser tiştan re  
beroşek mîdye daye ser serî, pêşgîr di destê din da  
“li welêt kurator bûm, li vir birçî” dibêje  
lê wek axayê Parîsê ye li ser Instagramê  
ba ye, me li vir jî divejîne, Fînî jî di nav da  
dûxana esrarê dixewîne guldankên kevzîn  
bazarek e ji sibê heya xewê, sî mest e  
zend in, li ser tiştên ji derb ketî digerin  
zindî bîranînên miriyan dikirrin bi hûrdeyan  
belkî rojek beroşa wî jî çend qirûş bike  
belkî jiyan ev e ya em “valahî” dibêjinê

bi carekê 1000 sal derbas dibin bi ser tiştan re

tu li min napirsî



# Lady Lazarus

Min dîsa kir.  
Di her deh salan de carekê  
Ez vî karî bi rê ve dibim-

Wek mucîzeyeke bi pê, çermê min  
Wekî sernikê lampê yê Naziyan birqok,  
Lingê min ê rastê

Wekî giraniya kaxizekê,  
Rûyê min asayî, nazik  
wek qumaşê Yahudiyan

Pêçika kaxezi jê bike  
Ey dijaminê min.  
ez te ditirsînîm?--

Bêvil, kokên çavan, taxima diranan?  
Hilma tehl  
Di rojekê de dê wenda bibe.

Di demek nêzîk de goşt  
ê ku şikefta gorrê xwariye, dê vegere  
Ser laşê min

Û ez jineke rû bi ken.  
Ez tenê sîh salî me.  
Û wekî pisîkekê, neh canên min ên mirinê hene.

Ev jimare sisê ye.  
Rûreşî ye  
Her deh salan carekê xwe tune kirin.

Bi milyonan tîrên hûrik.  
Xelkê adî  
Xwe diqelibîne da ku bibîne

Wan ez ji dest û lingan veçirandim--  
Strîptîza mezin.  
Efendî û xaniman.

Ev destên min in,  
Çokên min.  
Dibe ku ez çerm û hestî bim,

Lêbelê, ez heman jina berê me.  
Cara yekem ku ev qewimî, ez deh salî bûm.  
Qeza bû.

Cara duyem min dixwest  
Ku bidomînim û qet venegerim.  
Hatime girtin

Wek qalikên deryayê.  
Neçar man bang bikin û bang bikin  
Û kurmên li ser min mîna ênciyên zeliqok jê derxînin.

Mirin  
Hunerek e, wekî her tiştî.  
Ez pir baş vî karî dikim.

Ez wisa dikim ku wekî dogehê be.  
Ez wisa dikim ku rasteqîn be.  
Wisa dixuye ku ez jêhatî me.

Di hucreyekê de hêsan e.  
Hêsan e ku mirov bike û nemîne.  
Şanoyî ye

Ev vegera di ronahiya rojê de  
Bo heman cihî, heman rûyî, heman hovî  
Bangawaziya kêfxweş:

"Mucîze!"

Ev hiş ji serê min dibe.

Bedelek heye

Ji bo dîtina şopên min, bedelek heye

Bo guhdarkirina dilê min--

Ew bi rastî lê dide.

Û bedelek wê heye, bedeleke pirr mezin

Bo peyvekê an destdanekê

An dilopek xwîn

An tayek ji por an kincên min.

Wisa, wisa, Herr Doktor.

Wisa, Herr Dijmin.

Ez berhema te me,

Ez hêjaya te me,

Ew zaroka zêrîn a paqij

Ya ku bi qîrînekê dihele.

Ez dizivirim û dişewitim.

Nefikire ku eleqeya te çavên kêr dibînim

Ax û xwelî-

Tu dikolî û dikolînî.

Goşt, hestî, tişteke nemaye--

Kalocekî sabûn,

Gustileka zewacê,

Diranekî zêrîn.

Herr Xwedê, Herr Lûsîfer

Hay jê hebe

Hay jê hebe.

Ji nav êgir

Radibim bi porên xwe yên sor

Û mêran wekî hewayê dixwim.

*Ji Îngilîzî: Sîbel Akman*

# Şallaw Hebîbe

## ‘Hoşdarî ‘Bo Şa’îran

Le tolley ew hemû şewey bebê xewin jiyam, şerte bibme şa’îr. Le tolley ew hemû xewney be tenya jiyam, şerte bibme semakar. Le tolley ew hemû jiyaney nemirdim, şerte bibme belem, fermûy şepole bêwefakan bikem. Le tolley kêwekanî derûn ke hergîz neyangeîyştîmê, şerte bibme cadûbaz, sîhr le goranî û estêran bikem. Le tolley jinekan ke bejêyan hêştîm, şerte le giryanda bibme sêtar, le qur’anda bibme zeytûn, bibme xurma, bibme genim. Le tolley xom ke jinekanim becê hêştîm, şerte bibme rrawçî, bellam min hîç nîye ke rrawî bikem.

Mirov xoy rrawkirawêke. Minîş xewin û şî’r û sema, estêre û jin û cadû rrawiyan kirdûm. Le tolley ewey ke rraw kiram, şerte bibme şoste, tenyaîym be filterî jigere û debey betallî aw û kilenkisî bekarhatû pirr bikemewe. Bibme şa’îrêkî Dadaîy û le qutuyekî firrêdirawî bîrewe, cîhanêkî firrêdiraw bidozmewe. Le tolley cîhanîş, şerte bibme cîhan, firrêdiraw le cîhanî firrêdirawda, Leser rrêy wiştîrekanda, westaw le temtumanda, çawlerrêy tiramêk bim dellên rojêk degate *Mekke*. Le tolley ewey hergîz şar nebûm, şerte bibme *Mekke*, şa’îran bêne zîyaretim. Xewinçî, semazan, belemwan, kêwderûn-nasekan, ehlî cadû, jin û estêre, hemûşitzanan bêne zîyaretim.

Şerte bibme *Mekke*, şa’îran bikem be hajî û le şî’ir ke nizaye, hoşdarîyan bidem. Bêje: emeîş tolley bexewnan, ke bexewnan herêm-winin, ewaneîş ke herêm-winin, debne rrawkerî hamû şitek; rrawkiraw le cîhanî rrûxek û rrawkirawda. ●

*Tîpveguhastin: Sayo Receb*

# Şerîf Kaya

## Gêwîkujî

Devê tifingê li min rast kiribû. Min ti caran xwe bi sîlehekê nedîtibû. Bi awayekî baldar li rûyê min mêze dikir. Şeqizibûm, baweriya min nedihat ku ew li pêş min e. Heya ku devê xwe vekir û got: “Qey kêfa te bi dîtina xwe nehat lo?” Ji min wetrê bû, ez dîsa bûbûm mehkûmê yek ji wan xewnereskên xwe. Tepetepa dilê min bû; belkî ev hilavêtinên dawî bûn û çend saniye şûn de gulleyek dikaribû wî heta hetayê bide sekinandin. Bêhna min diçikî. Min herf û peyv li hev siwar dikirin, bi zehmetî bersiva wî da: “Min dîgo qey tu mirî.” Bi kenekî neşîrîn, got: “Heke te bizanibûya ez sax im, ev tifing niha di destê te de bû.” Min tafilê go: “Gerek nake tu wisa bikî.” Wiha bersivand: “Ev xanî ji bo du kesan pirr biçûk e.” Helkehelk bi min diket. Difikirîm ka çawa dikariyam ji vê belayê xilas bibim. Min gotê: “Lêbelê, lê lê...” Wî çavên xwe li hev qîç kirin û got: “Tu jî dîzanî, çare li her tiştî dibe, bes li mirinê nabe.”

Erê, min dîzanibû. Ji roja ewil de min dîzanibû. Ji dema ku Serok li ber mîkrofonê qîr û hawara xwe dikir, serî li welatên rojhilat û rojava hil dikir, min dîzanibû. Ne tenê ez, herkes dîzanibû ku ev kîn û nefret bi dengê vala naqede, tenê xwîn dikare vî agirî bitemirîne. Ka îro dê kî bixwaze di şûna telefonê de tifingê bigire destê xwe, di şûna balgiya nerm de serê xwe deyne ser kevir û kûçan? Herwiha bêyî leşkeran jî şer nedibû. Lêbelê, xebera ew cîhaza xerîb hat û em ji tifing û kevir û kûçan xilas bûn.

Dîwarên bajêr tev bi daxuyaniyên hikûmetê tijî dibûn, ji hoparloran herdem ev deng dihat: “LEŞKERÊ DI HUNDIRÊ XWE DE SERBEST BERDIN!” Xelkê bajêr gava cara pêşîn ev nûçe bihîst, bawerî pê neanîn, bileks henekên xwe pê kirin. Lê dema ku çend kes çûn navendeke “Leşkerê Hundirîn” û belgeya xizmetê bi dest xistin, em baş gihîştin wê qenaetê ku gotegot tev berra bûne. Cîhazek wisa çêkiribûn

ku di çend deqîqeyan de cêwiyekî eynî mîna meriv ji goşt û xwînê, bîaqil û hestdar çêdikir, tîfîngê didan destê wî û ew dişandin eniya şer. Helbet ev pêvajo ne belaş bû; yên ku pereyê wan têr nedikir, neçar bûn ku bi xwe biçin leşkeriyê.

Hikûmet ultîmatomê dabû welatîyan: Yan heta mehekê “leşkerê di hundirê xwe de” derxînin û belgeya muafiyetê bigirin, yan jî unîformayê li xwe bikin û herine şer. Jin, zarok û yên di ser pêncî salî re ji vê biryarê bexşandî bûn. Bêyî ku wext bibihûrînim, min hesabên xwe yên banqeyê xalî kirin û lep çûm yek ji navendên “Leşkerê Hundirîn”. Qiyametê xort li ber derî rêz bibûn. Piştî çend saetan encax dor hate min. Hemşîreyan bêyî ti daxuyanîyê ji min xwestin ku hemû cil û tiştên xwe derxim. Paşê ez li ser nivînekê dirêj kirim û dest û lingên min bi kelemçeyên hesinî girêdan. Rewşeke pir xofdar bû. Lê ji ber ku min ev pêvajo ji devê gelek kesan bihîstibûn, zêde jî xem nedixwar. Ez xistim hundirê çaviyê ji camê û deriyê wê bi ser min de girtin. Dema ku ez dirêj kirî bûm, min çavên xwe biribûn ser ekrana li hemberî min ku bi sirûdeke leşkerî merasîma “Leşkerên Hundirîn” nîşan dîda. Li ti derekî derheqê vê cîhazê de agahî nebûn. Hikûmetê ev weke “sirra şerî” pênase

kiribû; pirs û meraqa li serê yan jî nîqaşkirina wê bibûya sebeb ku meriv bi qeza û belayan re tune bikin. Di hundirê çaviyê de tiştê ku mirov didît, tenê derziyên ziravok bûn ku carê diketine laşê mirov û pê re jî lensên bi flaşên geş wêneyên meriv dikişandin. Ji xeynî sirûda leşkerî û axaftinên tund ên Serok, ti deng nebûn.

Piştî çend deqîqeyan min ji çaviyê derxistin û nîşaneke xwaromaro ku li serê “Xizmeta ji Dewletê re” û di binî de bi herfên biçûk “û ji Gel re” dinivîsî, anîn û dan min. Ez ji “leşkerê di hundirê xwe de” xilas bûbûm lê min wî nedît. Wer dixuya ku ji hêla din a navendê derdixistin. Helbet xem nebû ji bo min. Hema min dixwest ji leşkeriyê xilas bibim û hew. Di nav çend hefteyan de bajar tev bi navendên “Leşkerê Hundirîn” tijî bû. Heta hinek kamyonên mezin li kolanan digeriyan, cîhazên pir mezin ji cihekî dibirin cihê din û bi awayekî seyyar xizmetê didan. Roj li peyrojan derbas dibûn û nûçeyên serkeftinê li pey hev belav dibûn. Lê ev yek bi paşvekişîna cara ewilî re vala derketin. Herçend ev vekişîn sedî yekê axên hatine bi dest xistin nedikir jî, tirs xistibû dilê mirovan. A rast, tiştê ku her kes pê şeqizî û ma, têgihîştina vê yekê bû ku artêş “namexlûb” nebû.

Piştî çend rojan, Serok axaftinek kir û ferman da yên ku leşkerê wan ê

hundirîn di şer de mirine, lazim e yan dîsa bikevin nava wê cîhazê, yan jî bi xwe biçin eniya şerî. Ji wê rojê şûn de her roj di rojnameyan de navê miriyan dihatin weşandin. Mirov ditirsiyan ku navê xwe di lîsteyê de bibînin û cardin bikevin binê mesrefeke giran. Hinekan ji ber ku cewiyên wan gelek caran miribûn, her tiştê xwe winda kirin û di encamê de bi xwe çûn eniya şer. Du cewiyên min mirin û ez neçar mam ku dîsa bikevim hundirê wê cîhazê. Helbet ger leşkerê we yê hundirîn ne ehmeq bûya û bikariya çend mehan li ber xwe bide, hûn jî dikaribûn bêyî ku di jiyana we de guherîneke mezin çêbe, bedêla qaçaxiyê bidin hikûmetê.

Lê tişta ku kes li bendê nebû ew bû ku şer di carekê de qediya. Hikûmet bi xwe jî mat mabû. Axaftina serkeftinê ya Serok bê ruh û can bû. Wisa xuya dikir ku qey me şer winda kiriye, têk çûne. Şerê bi dijminan re qediyabû, niha divê me bi xwe re şer bikira. Êdî feydeya leşkerên hundirîn nemabû. Ji ber vê yekê hikûmetê ew şandin bajarên ku jê hatibûn, ango cem me. Dema şer tunebe, leşker hew dibin mesrefeke boş û bereday. Serok bi daxuyaniyekê leşkerên hundirîn wekî “lehengên şer” îlan kir û ji gel xwest ku çî ji destê wan bê ji bo wan bikin. Piştî hikûmetê ji bo parastina leşkerên hundirîn qanûnên nû derxistin; li gorî vê, her kes neçar bû ku her tiştî bi cewiyê xwe re nîvenîv parve bike. Heta

mal û malbat jî.

Lêbelê jiyanek ji bo du kesan heta bêjî pir biçûk û teng bû. Mirov dest bi kuştina cewiyê xwe kirin. Her roj di çeman de û di xirbeyan de bi dehan cesed dihatin dîtin. Nediya bû ku yê mirî leşker e an sîvîl e. Polîs jî zêde li pey kuştinan nediket; ji ber ku jixwe diya bû ewê gullereşandî kî ye yan jî kî kê li kê daye. Hikûmetê jî gava dît ku mirov bi serê xwe ji van “nîven zêdeyî” rizgar dibin, bi bêdengiya xwe nîşan da ku ew jî ne li dijî vê rewşê ye.

Yê ku cewiyê wî sax bû jî, bi dilekî rehet xew nedikir; heta ew ên bi jiyana hevpar hîn bibûn, zêdetir ditirsiyan. Hêdî hêdî di nav malan de belavokên ku xwediyê wan nediya, dihatin dîtin: “Ji xwe rizgar bibin.” Di binî de jî hejmareke telefonê hebû, ango we dikaribû bi peretî ev meseleya cewîtiyê bidana safikirin. Hinekan digot, bûne şahid ku kesên vî karî dikin unîformayên polîsan li xwe kirine.

Cewiyê min ne li meydana bû. Min gelek caran ji daîreyên dewletê pirsî wî dikir. Agahiyên wî nîşan dida ku ew hîn sax e; “Heke nehatibe malê, îhtîmal e hatiye kuştin,” digotin. Bi şevan di xewnê de min didît, hatiye ser serê min û bi werîsekî qalind min bi dar ve dike.

Lêbelê xewn pir neçûn û bûn rastî. Ketibû malê. Min ti caran xwe bi sîlehekê nedîtibû. Ez keniyam, ew jî keniya. Tişta hewce bû, bû. ●

# William Butler Yeats

## ‘Hezar û ‘Neh Sed û ‘Nozdeh<sup>1</sup>

I

Gelek tiştên lapî bedew î ciyê kiyasetê çûn deya  
Ku bi çavên muxulqet safî keramet dihatine xuyanê,  
Hêvişandî û parastî bûn ji çerx û çembera heyva  
Ku tiştên ‘amî yên li mexderê pûç dike. Li wê dera hanê  
Di nava misê zer û kevirê bi xeml û xêz û kokandî de  
Li ser piyan bû peykerekî dêrîn î çêkirî pê darê zeytûnê –  
Lo, bûn kaviî û wêran mahiyên navdar ên Fîdîas<sup>2</sup>,  
Pê re jî siwarên pîrê û mozên zêrîn<sup>3</sup> hemû; çûn, xelas.

Heyna em xort bûn, me jî arvanê xwe pirr li êş dikir:  
Qaydeyekî ku guh nedida lomekirinê yan jî pesinandinê,  
Bertîlîkirinê yan jî gefxwarinê; xeysetên ku xeletiya kebîr

<sup>1</sup> *Nineteen Hundred and Nineteen*: Li Ayrlendê sala şer û lêkdanên giran di Şerê Ayrlendê yê Serxwebûnê de li dijî ingilîzan û di Şerê Birakujîyê de. Çendîn şîrên Yeats hene li ser vê babetê. (t. w.)

<sup>2</sup> *Phidias*: Peykersazê Asînayî yê gewre yê ku di navbera 490ê û 423yê B. Î. de jiyaye. (têbîniya wergêrr)

<sup>3</sup> *golden grasshoppers and bees*: Thûkîdîdîsê (di navbera 455ê û 399ê B. Î. de jiyaye) mêjûnas û ceneralê grek amajeyê pê dike ku xelqê Asînayê broşên zêrîn î bi şîklê kuliyan (‘siwarên pîrê’ bi navê xwe yê dîtir î bi kurmancî) bi kar dianîn da ku porê xwe girê din. Bi cî nayê zanîn ka Yeats li kê derê peywendîya Asînayê li gel mozên, zêrîn yan jî bi şêweyekî dîtir, kifş kiribe, lê sîmbolîzma, berê xwe bidine şîra bi navê ‘Ponîjanên Di Dema Şerê Navxweyî De’, hingiv wekî xweşiya ciyê dîlîzîyê dibe ku peywendîdarî babetê be. (Jêderk: W. B. Yeats, *Berhemên Serekî tevî şîran, şanonameyan û pexşana rexneyî, sererast kirî tevî Pêşekiyeke û Têbîniyên Edward Larrissy*, Weşana Zankoya Oxfordê, 2008, Brîtanyaya Gewre, r. 505.)

Tev dihelandin, heçku şima bû li ber tîrêjên roniya cîhanê;  
Te dî nezera 'amê ku hinde wext bû digiha kemalê axir,  
Me got qey ew ê temendirêjtir be ji tevayiya rojên dema bê.  
Lo hizra çend xweş bû bi me re çêbû wekî em hizirîn  
Ku reh li nepaktirîn qulldirran û nemaman hatibû birrîn.

Diran giş rakişandibûn, xap û rîpên dêrîn giş xweberê,  
Pê re jî artêşeke giran, lê mîrateke ku pifî esmanan dikir;  
Çi firqî lo wekî hesinê ti topekê nehelandibûn çu carê,  
Hê nekiribûn gîsin? Bi bîr û boçûna parlamenê û qeyzêr,  
Heta agir bi piça barûdê neketa, xêr derbas nebûya ji xêrê,  
Çêdibû nefîrjenan teqînî ji nefîran bîaniya fîr ha fîr,  
Di gel hindê jî av li şikomendiyê germ nebûya; û te dî  
Hespên şerî yên xilmaş ên nîgehdaran hol nebûna bi qurretî.

Êdî ejdiyaq colî ser serê rojan bûne, xewnereşk bi xwe  
Rabûye ser zînê xewê: komeke serbazên vexwarî têr e  
Dikare di cî de bihêle dayîka hatiye kuştin li ber deriyê xwe,  
Ku di nava xwîna xwe de bigevize, û bi fikefîk here;  
Şev dikare xwêdanê bide ji ber sawê ça' ku berê jixwe  
Me pê hizrên xwe kiras difesiland ji felsefeyê re  
Û pîlan datanî wekî em cîhanê bînine binê hukmekê de,  
Em ên ku kurrebeşk in û hew, yên şer dikin di kunekê de.

Bo yê ku dikare nîşaneyan bixwîne, her çi be jî, nakeve  
Ber bayê nîv-xapandina nukteyên sermestker  
Ên 'eqlên sivik; bo yê ku pê dizane her berhem dikeve,  
Çi tenduristî, çi dewlemendî, çi jî aramiya dilrihetker  
Serifîbe li şahkara berhema zîrekiyê yan jî destan e,  
Çu rûmet bi cî nahêle abîdeya wê ya hêzdar,  
Xemrevîniyek dimîne û hew: tenhayiya wî ya spêleyan  
Çu caran mil danayne li ber serfiraziyan hemûyan.

Lê ka gelo ti xemrevînî heye mirov xwe bigihînê?  
Mirov dilberdayî ye û dil berdide heçî ku betave dibe,  
Wekî din çi heye mirov bibêje? Li çarnikarê welatê hanê,  
Ku hizreke wisa ya wî bûya, kes nediwêrî biqebilîne  
Wekî hene sofikên reşekuj yan jî kesên êgir berdidinê  
Da bişewitînin wî kavilkê li ser Akropoliya<sup>4</sup> bêlan e,  
Yan jî bişikênin, mahiyên navdar hûrhûrî bikin  
Yan jî qaçaxçîtiya siwarên pîrê yan jî mozan bikin.

## II

Ku reqqasên çînî yên Loie Fullerê<sup>5</sup> li xwe dilefandin  
Perdeyeke bi şewq û şemal, qeytanekî pêlpêlî yê caw,  
Heçku ejdiyaqekî mutewellidê ji hewayê  
Ketibû nava reqqasan, ew dolebanî kiribûn bê sekin  
Yan jî firqas dabû wan li ser xûlgeha xezebnak a caw;  
Sala Felatûnî<sup>6</sup> jî bi wî awayî  
Dizivîrîne û rastî û çewtiya nû davêje hêlekê,  
Di dewsê de rastî û çewtiya berê dizivîrîne;  
Mirov hemû reqqas in û dimeşin û berê xwe didine  
Zingezinga barbarane ya qecer a gongekê.

## III

Şa'irekî exlaqparêz yan jî ehlê efsaneyan  
Ruhê bi tena serê xwe dişibîne qubeqazekî;  
Bi wê yekê xweşhal im ez bi xwe,  
Xweşhal im heke awêneyeke şêlî wî bide nîşan,

<sup>4</sup> *Acropolis*: Beşê bilind ê keleha Asîniya antîk. Perestgeha Athenayê, yan jî Parthenon, heybetmendtirîn avahiya wê ye. (t. w.)

<sup>5</sup> *Loie Fuller's Chinese dancers*: Marie Louise Fullera danskera emerîkan a di 15ê Rêbendana 1862yan de li Fullersburga Illinoisyê ji dayîk bûyî û di 1ê Rêbendana 1928an de li Parîsê mirî. Wê kompaniyayeke xwe hebû ku pêk dihat ji dansker û reqasên capon. Di berhemên xwe yên dans û reqsên pêlpêlî de kompaniyaya wê caw û perdeyên biguveguyî 'ecêb bi şewq û şemal bi kar dianîn. (t. w.)

<sup>6</sup> *Platonic Year*: Yan jî 'Sala Gewre'. Dewreke mezin a demê, di dawiya kîjanê de gotî stêrk vegevine derawayên ku di henga afirandê de li ser bûn. Jêderka vê hizra Yeats şerha Felatûn e ku di berhema wî ya bi navê *Timeyos* de hatiye. (t. w.)

Beriya ku betave bibe ew çirûska kurt a jiyana wî,  
Nimûdeke 'hal û 'hewalê wî bi xwe;  
Baskên xwe nîv vedayî ji bo ku bifire,  
Sîngê xwe dayî pêş bi fexr û şanazî  
De bê ka bilive û bilîze, bajo yan jî  
Wan bayên ku radikin qalmequrta şeva tê pê re pê re.

Mirovekî xeware bûyî di hizrên xwe bi xwe de  
Berze dibe li nava gêjgerînkê wî bi xwe çêkirî  
Li warê hunerê yan jî polîtîkayê;  
Yekî Felatûnî<sup>7</sup> tîne dibêje ku di wê qedemeyê de,  
Ku divê em bedenê û sin'et bavêjin li wî warî,  
Qiyafeta dêrîn dizeliqe pê ve, çu pê nayê,  
Û dibêje heke ji berhemên me bê, wekî ew  
Bibin pariyeke nan bi nemana henaseya me re,  
Mîrîn dibe mirineke def û dewat ji me re,  
Çi ku serfirazî dişê tenhayiya me têk bide û hew.

Qubeqazî firqas da xwe berev nava esmanê dêran:  
Ew nimûd dikare hovîtiyê bîne, bîne xezebekê jî,  
Ku kutayiyê bi her tiştî bîne, ku kutayiyê bîne  
Bi heçî tiştê hatî xeyala jîna min a tijî ji dijiwariyan,  
Laperra nîv-xeyalkirî, laperra nîv-nivîsayî jî;  
Lo lê belê me xewn bû em çak bikin, ma ne,  
Her nepakiyeke ku te digot qey  
Dizêrand ademîzad, lê ku vê gavê  
Bayên zivistanê dikin guveguvê,  
Em hîn dibin em seme bûne dema em xeyalbaz bûne hey.

<sup>7</sup> *Some Platonist*: Dibe ku peywendîdarî felatûniyê inglîz, Thomas Taylor (1758-1835) be, ku, di şiroveya bo wergera xwe ya berhemeke 'Neo-platonic', *De antro nympharum* ('Li Ser Şikefta Periyân') a Porfirios de, dereve dike wekî giyanên miriyan formên fanî ji bîr nakin çî qasî jî jiyanên xwe yên takekesî ji bîr kiribin. (Jêderk: W. B. Yeats, *Berhemên Serekî tevî şî'ran, şanonameyan û pexşana rexneyî, sererast kirî tevî Pêşekiyeke û Têbîniyên Edward Larrissy*, Weşana Zankoya Oxfordê, 2008, Britanyaya Gewre, r. 505.)

#### IV

Em, me yê ku heft sal berê  
Qala rûmetê û qala rastiye dikir,  
Em diqîjin bi xweşî heke em werrê  
Beş bikin çîva kurrebeşkî, diranê kurrebeşkî yê dirr.

#### V

Werin em qerfên xwe bikin bi gewreyên  
Ku barên wer giran hebûn di zêhna xwe  
Û bi saetên dirêj ew qas çetinayî kişandin  
Da ku abîdeyekê bihêlin li pey xwe,  
Bêyî ku bayê tep dike bînine bîra xwe.

Werin em qerfên xwe bi zanayan bikin;  
Tevî wan salnameyan gişan, li kîjanan  
Wan çavên jandayî yê pîr kutabûn,  
Wan qet nedît heyam ça' diçûn, nediman,  
Niha bes li hetavê dinihêrin bi matmayîn.

Werin em qerfên xwe bikin bi pakên  
Digotin qey çêdibe ku pakî şên be,  
Wan ên ji tenhayiyê hevreşî bûn  
Dikirana cejneke bikin 'elam e:  
Bayî kire qîjînî – ka ew pak li kê derê ne?

Paştirê qerfên xwe bikin bi qeşmerên,  
Heylo, destê xwe jî ranakin barikem  
Da li pakan, zanayan yan gewreyan darinde bin  
Da wê babelîskê der bikin, çîma ku em,  
Bazirganiya qeşmeriyê dikin em.

## VI

Tundûtûjî li serê rê û dirban: tundûtûjiya hespan;  
 Siwarên çendekan ji wan kexşe ne û zerzengên xwe  
 Hene li ser guhên fit î nazik yan jî bijiyên ber ve ba,  
 Lê westiyayî ne hingî di rêgehên xwe de dane çindikan,  
 Giş dipekin û betave dibin û nepakî bezê dide xwe:  
 Keçên Irodiyasê<sup>8</sup> dîsa vegeriyan pê de pê de,  
 Ji nişkê ve teqîneke bayê bixubar û paşê  
 Gurmegurma piyan e radibe, geremola nimûdan,  
 Qesd û xereza wan berze li nava gêjgerînka bayî;  
 Ê eger bihê û destekî şet biwêre bimerêse keçekê,  
 Giş dizivirin tevî qîrreqîrrên evînbaz yan jî ciyê qehran,  
 Çi ku giş ji çavan mehrûm in li pey kawdana bayî.  
 Lê êdî ba datîne, toz û xubar diedile; wê hingê  
 Di wir re dişelişe, ku çavên xwe yên gir bê xem bûn  
 Li ber sîbera biskên qîçik î kenê miriyan tînin,  
 Dişelişe ew Robert Artissonê<sup>9</sup> iblîsê bê par ji edebê,  
 Ji kijanî re Xatûn Kytelera<sup>10</sup> bê par ji evînê anîbûn  
 Pûrtên tawisê yên qemirî, kimşikên dîkên wê yên sor in.

1919

*Ji inglîzî: Kawa Nemir*

<sup>8</sup> *Herodias' daughters*: Irodiyas di navbera 15ê B. î. û 39ê P. î. de jiyayî di dewra Împeratoriya Romayê de dotmîreke binemala Irodiyan a devera Yehûdahê ya Îsrailê bûye. Di têtîniya xwe ya bo şî'ra xwe ya bi navê *Artêşa Sidhe* (Gelawêj 1893) de Yeats nivîsiye: "Xwedayên Ayrlenda dêrîn, Tuatha dé Danaan (Xelqê Xwedawend Danûyê), yan jî Hozên Xwedawend Danûyê, yan jî Sidhe, ji 'Aes Sidhe'yê, yan jî Sluagh Sidhe, gelê Gir û Gazên Periyân, çawa ku ev peyv exlebe tîr şirovekirin, hê jî mînanî berê li nava welêt bi siwarî digerin. 'Sidhe' her wiha bi geylî 'ba' ye û bê guman pirr peywendîdarî bê ye. Ev xelq tevî bayê bi gerînek û guveguv rêwîtiyê dike, bayên ku di Serdemên Navîn de digotinê, reqsa keçên Irodiyasê, der ji şikberiyê ye ku Irodiyasê dewsa xwedawendê berê girtiye. Dema ku gundiyan kal û pîr pelên li ser rê ketî ber gerînekan dibînin, xwe teqdîs dikin, ji ber ku ew bawer dikin xelqê Sidhe di ber wan re derbas dibe." (Jêderk: *W. B. Yeats, Berhemên Serekî tevî şî'ran, şanonameyan û peşana rexneyî, sererast kirî tevî Pêşekiyeke û Têbîniyên Edward Larrissy, Weşana Zankoya Oxfordê, 2008, Brîtanyaya Gewre, r. 476.*)

<sup>9</sup> *Robert Artisson*: Di têtîniya xwe ya bo vê şî'ra xwe de Yeats nivîsiye: "Xelqê gundî carinan hindek spēleyan dibîne ku niha bi nav dike wekî 'melekên ketî' û 'akinciyên dêrîn ên welêt' û salix dide wekî ew spēle car caran 'kulîlk li ser serên hespan' bi siwarî digerin. Di şî'ra şeşem de min hesiband ku ew siwar, ji ber ku di vî zemanî de rewş xerabtir dibe, bi xwe xerabtir dibin. Sîmbola min a dawîn, Robert Artisson, sawêrekî nepak bû ku di destpêka sedsala çardehem de li Kilkennyê xelq zehf bi pey diket. Vêca qey ew ên ku di nava toz û xubara ketî ber gerînekan de rêwîtiyê dikin jî ne di Sala Felatûnî de ne?" (Jêderk: *W. B. Yeats, Berhemên Serekî tevî şî'ran, şanonameyan û peşana rexneyî, sererast kirî tevî Pêşekiyeke û Têbîniyên Edward Larrissy, Weşana Zankoya Oxfordê, 2008, Brîtanyaya Gewre, r. 483.*)

<sup>10</sup> *Lady Kyteler*: Xatûn Alice Kytelera ku di navbera salên 1263yan û 1325an wan çaxan de jiyaye. Alice Kyteler li Ayrlendê yekem kesa tomarkirî ye ku ji ber pîrebokiyê hatiye tawanbarkirin û mehkûmkirin. (t. w.)

# William Shakespeare

## Soneyê 66.

Nê pêroyîn ra qedîyaya ez, mergêko aram qîrena,  
Ke vînena merdimo erjîyaye sey parsekî zayo,  
Û yê ke pûç ê, bi xeml û xêz ameyê xemilnayîş,  
Û bawerîya tewr pake, bi bêbextîye ameya şiknayîş.  
Û rûmeto zêrîn, bêbextan rê ameyo dayîş,  
Û pakîya zerrîye, bi nêheqîye bîya qehpeyî,  
Û kamiliya bêqisûre, bi çewtî ameya riswakerdiş,  
Û qeweta şêran, verê textê langan de ameya betalkerdiş.  
Û ziwano delal ê hunerî, hetê zorbazan ra ameyo lal-kerdiş,  
Û kor-nezanîye, bi edayê aliman hîkmetî rê ferman dana,  
Û raştîya rûte, sey xamîye û kor-famîye ameya hesibnayîş,  
Û rindo hêsîr kewto binkotîyê xirabkaro serdar:  
Nê pêroyîn ra bêzar a ez, wazena bitereknî nê warî,  
Xeyrê yew çîyî; eke ez bimirî, delala mi do tenya bimano.

*Îngilîzkî ra: Azad Kaysadu*

Yunus Karakoyun

## Dilê Hespê Mirî

Birîna li ser singa wî  
Li hember bayê li ber xwe dide

Ez di tariyê de diçim malê  
Evîndarê yekem ê bêgunehiya zarokatiyê

Germahiya çermê wî dibiriqe  
Dema ku navê wî tê gotin, rûyê wî dibe sorê hinarê

Ji ber ku dem li vir winda ye  
Sarbûneke metalîk, amadekariya zivistanê

Helbestek mîna bêdawîtiyê  
Û devekî reş ku stêrkan dadîqurtîne

Ez red dikim, ew bêdeng dibe  
Bêmalîtî mîna dilê hespê mirî ye

Komên çûkên reş derbas dibin  
Bi dengê xemgîn ê kemande kevin

Gunehê yekem ê avê di neynikê de  
Yek kulîlka helbestvan, ya din şermok

Navê wê di bireke kevirî ya jibîrker de  
Perçeyên herî piçûk ji bo tunebûnê vedibin

Û ez leza xweliyê fam dikim  
Tiştê herî dijwar ji bo helbestvanekî

Êşa mayî ya ziman e

# Hevpeyvin

Lokman Ayebe:  
“welatê peyvên min pirr kevn e”



**1. “Aqil diçe sewda dimîne”?**

helbet, çima nemîne! lê ew aqilê li ber sewdayê debar nekiribe yan jî li ber wê sewdayê netebitîbe û dabe rê û çûbe jixwe ne tu aqil e bila bicehime here. îjar wê sewdaya starî nedabe êqil jî rijî ye, xav e, pûç e û piştî wextekê ji serêşiyê pê ve dê kêrî bi tu tiştî neyê.

**2. Her tişteke divê çend taybetmendiyên xwe hebin û heke ji yekê zêdetir bin ew çi ne?**

ez dibêjim qey însan e. lewra li ser rûyê erdê tiştê herî bi kompleks, tewşomewşo, qaotîk û bi taybetmendiyên xwe bêpîvan însan e.

**3. Gava cara pêşî te çîrokeka Poeyî xwend, tu çi fikirî?**

min bi helbestên wî ew nas kiribû. ji ber wê gava serê ewil min çîrokên wî xwendin ez di çîrokên wî de jî li hêviya rîtmeke muzîkal bûm, lê bi xwendina çîrokên wî re li atmosfereke klostrofobîk rast hatim û tengezariyekê xwe li canê min da der. ez wê çaxê lê hay bûm ku di edebiyatê de atmosfera klostrofobîk û tengezarî jî dikare tahmeke xweş li însên peyda bike.

**4. Niha çi ji te ve xuya ye?**

weke di tariyê de li hemberî mirêkekê me û li xwe dinihêrim. ya di vê mirêke de ji min xuya dibe ne wechê min e, ez di kurahiya wechê xwe de barê rabirdûyê û xema siberoya xwe dibînim. yanî ne dîmen lê mane

di vê mirêke de ji min re xuya dibe. maneya valahî û bêdengiyêke kûr û jiyanêke basît û ji rêzê... mîna borges dibêje: kor ne ew kes in ku nabînin kor ew in ku dibînin lê jê fahm nakin.

**5. Îsal zadê aliyê Dêrikê çawa bûn?**

îsal baran xweş ket, zad baş ber da lê belê mixabin dewletê nixê zad kêmdaniye û misrefa çandiniyan jî giran e. li aliyekî jî adeta cotkaran e, zêr li simbilan bide derjî dê dîsa bikin nûkenûk û bibêjin: “îsal tişt ji zadê me nehat.”

**6. Tu herî zêde ji çi hez dikî?**

ji berêvarê şemîyan, û tew di ser re ev şemî rojeke hênîk ya biharê be.

**7. Welatê peyvên te kîjan e?**

welatek e ku ji kûrahiya hezar salan ya dîrokê tê. bi etîmolojî, sentaks û fonetîka xwe, bi toz û tebara xwe, bi eks û inyada xwe jê haydar im ku welatê peyvên min pirr kevn e, lê entîke ye.

**8. Te xêr e, tu çima dinivîsînî?**

xêr û gunehê wê nîzanim lê bêtî bîkevim heft û heştê û li dû hesabekî; jixweber û bêhemdê xwe dinivîsim. min ewil ji xwendinê hez kir û vê hezkirina xwendinê jî pey re arê nivîsê li min har kir. weke gelek kes dibêjin nikarim bibêjim “ji bo kurdî dinivîsînim”. kurdî ji bo motîvasyonê nivîsandinê ji min re hêmanek alîgir e lê ne ya sereke ye.



**9. Ew kî bû ya derdekî te dikir sed hezar?**

ew kesên ku dibêjin gul ne/xweş e. îjar mirov ji gotina wan fahm nake gelo ka dibêjin gul “*nexweş e*” yan gul “*ne xweş e*”. heger nexweş be xwedê şifaya xêrê bidê lê heger na ew gul ne xweş be jî îjar bila xwedê sebr û aramiyê bide.

**10. Tu jî kê re dinivîsînî?**

ji bîreke bêbinî re... lewra nivîsîna bi kurdî nemaze jî edebiyata bi kurdî dişibe kevirê tu diavêjî bîreke bêbinî.

**11. Mirovantiya çem û çiyayan ji kû tê?**

ji ber ku kurdistan di mejiyê min de weke welatê çem û çiyayan hatiye kodkirin, çem jî çiya jî weke du stûnan rasterast hêmaya kurdistanê di mejiyê min de ava dîkin. ji ber wê bi min çem û çiya du zarokên sêwî yên kurdistanê ne.

**12. Ka pîrsekê ji xwe bike û bersiva wê nede lo.**

tu dixwazî li kû û çawa bimirî? li welatê te lê xwedêdayî yan li xerîbiyê; bi derbên kêran an di nava livînên xwe de bi aramî?

# ‘Bîrdanîk:

‘Faîq ‘Bucak  
(1919–4.07.1966)

‘Mîr Geladet ‘Alî ‘Bedir–‘Xan  
(26.04.1893–15.07.1951)

Qedrîcan  
(1916–09.08.1971)



‘Faîq ‘Bucak



Qedrîcan



‘Mîr Geladet ‘Alî ‘Bedir–‘Xan

# Faîk Bucak

## Hêviya Birîndar

*Li serê çîyan, di sermê de kon danî. Roj kin bûn, xurt derbas dibine.*

*Tîrêjtav pişta me germ nakiye. Kirasê me tenik e. Em bêxweyî ne, bêkes in.*

*Em Kurd, tim û tim, bi hêvî û bi spasiyan ve jiyî ne.*

*Em ê niha ji we re şihîra "Hêviya Birîndar" bixwînin.*

Hêviya Birîndar

Şev dirêj e, birîn kûr in,  
Dinalim di nav dirişkan de,  
Bi tenê mame, sêwî bûm.  
Birîndar im;  
Dil û gurçik ji hêstiran tijî xwîn.  
Şev ê here, darî dipê, dikalim.  
Tav ê vêkeve, ez xerbilîm, sibe be,  
Teyran per rijandin, stêrk giriyan.  
Li kû pismam,  
Kanê heval û hogir û cîran!  
Şev ê here, belkî can dîsa bê.

(Faîk Bucak şano-helbestek nivîsandiye. Berhema xwe li ser kasetekê xwendîye. Malbata Bucakî ev kaset dane Ferhadê Mihemedî. Wî jî destûr da ku em beşek ji vê berhemê biweşînin.)

# Mîr Geladet Alî Bedir-Xan

## Alê Kurdan

Alê kurdan di navrok  
Çi bedew û biheybet  
Bi çar reng î, rengên te  
Çi delal û çi xweşkok

Xêzek kesk û xêzek sor  
Nav spî û nîvek zer  
Keskesor e, bi roj e  
Ev li jêr û ew li jor

Semyana keç û lawan  
Rûmeta jin û mêran  
Neyarên te pir jî bin  
Tu dê bidî bera wan

Ko çirisî roja te  
Dê belav bin mij û dû  
Rabe ser xwe ser bilind  
Nîzing bûye rûja te

*Hawar, h. 5*



# Tabûta Bixwîn

-Şêx Ebdrehmanê Garisî çû rehmetê-

Li erdê dinêrim dilopên xwînê  
Didime ser şopê çî bibînim ez  
Dar û ber, kevir kuç giş dîkin şînê  
Bê hemdê canê xwe diqîrim ez

Tabûtek di nava ewrekî bi xwîn  
Melekan kişandin ezmanê jorîn  
Tirseke da ser min lebitîm ricifîn  
Ber çavê min reş hat dil bûrîn im ez

Ew tabût, tabûta Evdê Rehman bû  
Ser dinya derewîn ew yek mêvan bû  
Ger terk heyat bû, cinet mekan bû  
Bi rehma wî şabin hemî Kurd û ez

Lê sed heyf ji bo te ey rehman şêx im  
Çiqas Kurd hene ji bo te bêxim  
Têlkê gaziye, û lêxim lêxim  
Ew hawar hindeke jê têr nabim ez

Şehadet, me ne dît wisan bi `îbret  
Cinayet, xiyamet wisan bi rîqqet  
Ji bona mirovê xudan himmet  
Tarîxa roja te şîn! qeyd dikim ez.

*Hawar, h. 11*

# ‘Belgedank 2: ‘Teblixa ‘Resmî, Agirî/ 9 ‘Temûz (1930)

Sedat ‘Ulugana

Teblixa Resmî, Agirî/ 9 Temûz (1930).

(Xoybûn: civata welatê Kurda / hewêrge 1)

1. 5 temûz mufrezeyek Agirî semera hududê Tirkan ra, ku Burnêreş dabû, tarûz kiriye, ji Tirkan Sersed Mihemed Eli Beg û duwanzde esker kuştiye, şeş birîndar daye. Efradê mutebat temam dîl girtiye. Ji Tirkan ferdek nefîlitiye, xelas nebûye.
2. Yek top, du mitralyozê mezin (Dikris), sê otomatîqê bi navê Hoçkis, çil û pênc tiving, bombe, cepxane, makîneyek telefonê, heyşt çadirê mezin, sair eşyayê eskeriye ixtinam kiriye. Sê şehîd, birîndareki xefîf heye.
3. Îro 9 temûz Tirkan mifrezeya xwe ji Burnêreş rakiriye û çiqas çadir û mazxalên Bazîdê hebû qewitiye.
4. Aliyê Diyardînê dengê topa dihat. Hêj xebera me nehatiye.

[Setr: Xayê Bolukê]


Fermandehiya Agirî.

فهرست  
جملات و لغات آذربای  
فارسی

تجلیح و تفسیر

آذربای  
فارسی

و تون ... ستر ...  
نرخ ...  
کوشی ...  
دی ...  
یک ...  
چل ...  
چادر ...  
شهر ...  
ایرو ...  
در ...  
آ ...  
[ستر : ...]  
فرمان ...



Rostem Axale

“Dergay azadî be pallpêwenan dekrêtewe”  
(100 x 70 cm)



Nurî Dêrsimî

(Adar 1893, Axxironîk – 22.Tebax.1973, Heleb)